

Hunermend Seîd Gabarî:

Rola hunermend
ne kêmîrî rola serokekî ye

Rûpel 8-9



Mezlûm:

çandî ziwaye

Rûpel 10

çandî zimanê kurdî nas

NAVEROK



4

Samî Brebang: Çend nişe li ser pirtûka Deham Evdîlîfetah



11

Berzan Mirdêsî: Kongreya Enstîtuya Kurdî



16

Zana Farqînî: Ew stêr in jî çavên me dixuricin

Ji Xwendevanan

XEBERÊK pir xweş ji xwendevanekî rojnameya Radikalê de roja 12'yê berfanbara 1996'an bi sernavê "Sağol kamyoncu" hatiye weşandin. Tê de, tê gotin ku rojeva Tirkîyeyê şofêrê kamyonê kifş kiriye.

Nivîs wiha dom dike: "Ev qezaya ku te kir, bû sedem ku dewlet û hikûmeta 'pak' bikevin nav dest û piyan."

Dom dike, dibêje: "Şofêrê kamyonê di vê bûyerê de karkeran temsîl dike. Ew mersedesa ku kamyonê lê xist di hundirê wê de mafya û hêzên kontra û bûrjûvazî tê de hebûn û bi vê bûyerê karkerekî, rûyê Tirkîyeyê yê qirêj li ber çavan raxist."

Li aliyekî karkerên Tirkîyeyê, li aliyê din jî Çiller, Ağar, Eşîra Bucakan û CIA. Lê bi taybetî hêza welatparêzan ya ewil e. Xwediyê kamyonê Hasan Gökçe ji ber ku di 4'ê berfanbarê de bêhemdî qeza kir, bi daxwaza 4-10 salên zindanê derket hemberî heyeta dadgehê. Lê bi rastî gunehê wî jî bêdiqetiyê zêdetir kifşkirina sûcên dewletê ye û teşhîrkirina kontr-gerîlaya ku serokê koma provokatoran Cem Ersever kuştîye. Şofêr ew qas tê sûcdarkirin lê ji bo bêdiqetîya wî em jê re pir spasiyan dikin, tu bijî şofêrê kamyonê. Her wiha em spasdarin ji xwediyê vê nivîsê re, ji sedemê vê nivîsa wî, ew mirovekî pir 'bi rûmet e, bila ew jî wekî şofêr tim bijî lê ew mislimanên kurd û tirk li ku ne ku ji bo Xwedê çûn Mewlûda Sûleymanîyeyê, bila pozê wan bişewite, fedî bikin tim qehrû Xwedê li wan be, ji-bo ku ew alîkariya zilmê dikin. Xwedê tim zalîman qehr bike.

MELE KEREM



MGK cudakariyê dike

SAMÎ TAN

Bûyera Susurlukê gelek tîkiliyên kirêt bûn hêzên dewletê li ber çavan raxistin. Tiştê ji bûyerê balkêştir helwesta çapemeniya tirk a li hemberî bûyerê bû. Çapemeniya tirk ev bûyer wekî mîlad bi nav kir. Kampanyaya ku çapemeniyê piştî vê bûyerê dabû destpêkirin hê jî berdewam e.

Li gorî hinekan dubendî di navbera Partiya Refahê û xwediyên medya tirk de heye, lewre ev qas medya bi biryarî bi ser bûyerê de diçe. Bes hinek paşgotinî û kirinên medyaya tirk mirovan dixin gumanê. Tê gotin ku du aliyê dewletê bi hev ketine, nehênîyên (sirên) hev didin der, li aliyê din li gorî xebatkarekî Kanal-D'yê MÎT'ê ji Uğur Dündar re gotiye "heta ku tu dikari here." Dîsa Nûnera Rojnamegerên Sînornenas Nadir Materê, piştî ku helwesta çapemeniyê ya li hemberî aşîxwazan bi bir dixist, li ser îlanên ku di rojnameyên giregir de derketine şika xwe bi vî rengî anî zimên "wisa dixuye ku navên gelek kesan ji bordroya

van hatiye girtin." Tiştê balkêş jî hewla veşartina tîkiliya çeteyan û şerê qirêjî ye. Heta haçe gotin ku mafê dewletê heye ku li dijî PKK'ê karê ne-qanûnî bike.

Lê tu tiştî bi qasî rapora MGK'ê ya heftiya çûyî, sedema cengaweriya medya tirk eşkere nekir. Ev rapor bi zelalî dide xuyan ku medya tirk xwe cesaretê ji artêşê distîne. Jixwe çapemeniya ku qala paqijiyê dike, piştî berdana leşkerên dîl, da zanîn ku helwesta wê ya li dijî aşîyê nequheriye. Rojname û tv'yên tirk, ji xayîna leşkerên ku hatine berdan bigire, heta xayîna Fetullah Erbaş tiştê nehiştin.

Piştî van gotinan, ez dixwazim li ser rapora MGK'ê ku roja 18'ê mehê di rojnameya Milleyetê de derket, rawestim. Kesên ku ev rapor amade kirine, xwestine artêşê li derveyî qirêjîyê bihêlin, lê mixabin ev yek ne hêsan e. Li gorî raporeke ku ji aliyê "Şaxa Ewletiyê ya Emniyeta Stenbolê ve hatiye amadekirin, di nava salekê de 18 çete derketine holê û 23 serbazên giregir û 23 se-

rokpols jî di nav de 347 leşker û polîs ji ber endamiya wan çeteyan hatine girtin. Lê dîsa jî wekî ku artêş li derveyî çeteyan be, rapor qirêjîyê dike stûyê polîs û siyasetvanan û dixwaze ku destnedana mebûsan bê rakirin, timên taybet bikevin bin fermana artêşê. Li aliyê din di raporê de HADEP û rêxistinên mafên mirovan wekî hedef tînan nîşandayîn, tê xwestin ew rêxistin û parti bînan tengavkirin.

Di raporê de xala herî girîng gotinên li ser nifûsa kurdan e, tê gotin ku wê di sala 2010'î nifûsa kurdan digihîje ji sedî 40'ê nifûsa Tirkîyeyê, di sala 2025'an de ev rêje dê ji sedî 50'yî wê bibore. Di raporê de ev yek wekî tehdît hatiye destnîşankirin û kêmkirina nifûsa kurdan tê xwestin.

Yanê MGK'ê ji zêdebûn û pîrbûna kurdan ditirse. Lewre her wekî çawa ku kana hemû qirêjiyan şerê li dijî kurdan, dînamîka sereke ya ku paqiyê pêk bîne jî kurd bi xwe ne. Ev rastî bi mîtinga ku HADEP'ê roja 15'ê mehê li Stenbolê pêk anî, xweş xuya bû. Li dora 20 hezar kesî da zanîn ku bêyî aşîyê paqijî çênabe. Rayedarên dewleta tirk heta niha kurd bi cudaxwaziye sûcdar dikirin, lê ji ber tîrsa ku wê hejmar kurdan ji ya tirkan derbas bibe, êdî ew bi xwe îro bi awayekî eşkere cudakariyê dikin.

Bersiv kesaniya hemdem e

ÇIGERSOT BOTANÎ

Tê zanîn ku di jiyana civakî de rista (rola) kesaniyê pir girîng e. Ji vê girîngiyê ye ku hemû sistêmên civakî ji bo xwe kesaniyên ku karibin bersiva jiyana civaka wê bidin, amade dikin.

Di dîroka hemû civakên biçîn ên cur bi cur de ev rastî pir aşîkar e. Îro di sistema kapitalîzmê de ev rastî di her aliyekî jiyandê de xwe nîşanî me dide. Sistem li aliyekî ji bo xwe kadroyên teknik, hunerî, wêjeyî, çandî û siyasî û hwd. amade dike, li aliyê din jî kesaniyên ku karibin xizmetî wê bikin û di bin tu êş û wanan de dengê xwe bilind nekin, tînan gihandin. Sistem ji bo pêkanîna vê kesaniyê hemû dezgehên xwe dixebitîne. Her roj, her saet kesaniyê dixê bin bombebarana îdeolojîya xwe.

Di encamê de kesaniyên nezan, bêbawerî, bêbîrdozî, bêrêxistin û neçar tîne holê. Ev jî tê wateyê ku pir kes di navbera hebûn û tunebûnê de bimîne û ji rastiya xwe, ji rastiya welatê xwe û ya civata xwe bireve. Belê em dizanin ku heta kesaniya raman û bîrdozîyeke zanistî û hemdemî neyê avakirin, mirov nikare pîrsgirêkan careser bike.

Gemara fistûbîna sistêmê dijina

Divê ku ji bo bersivdayîna pîrsgirêkan û sistêmê, kesaniyê nû û azad bête amadekirin. Ji bo vê kesaniyê jî, bîrdozîya hemdemî û zanistî pêdivî ye. Belê ev tenê ne bes e. Divê rêxistin, disîplîn, fedakarî, wêrekî, îrade, hîskirina mirovahî, hîskirina welat û azadî û wekhevî û gelek tiştên dîtir, bêne pekanîn.

(bêvla) hemû kesan disoje. Êdî hemû çavên nebînin jî dizî, çepelî, hovîtî û çeteyîyên ku di nava sistêmê de xuya dibin, dibînin. Xebata azadî, wekhevî, demokrasi û aşîyê bi salan e tê dayîn, hemû qirêjî û gemariya sistêmê derxistiye holê.

Bi kurtayî mirov dikare bêje, "rim êdî di tîrê de nayê veşartin." Gemara şerê qirêjî eşere bûye. Lê mixabin hêj gelek mirovên ku dibêjin "Em ronakbîr in, em sendikavan in, em demokrat in, em bi gelê xwe ve girêdayî ne", li himberî van rastiyan bêdeng dimînin, ranabin ser piyan, li hemberî sistêmê xebateke girîng nakin.

Her kes xebata xelaskirina xwe û malbata xwe dike. Sedema mezin a belkêş ev kesaniya rizî ye ku sistêmê pêk aniye. Bi rastî jî sistêm li ser milê vê kesaniya pûç xwe didomîne. Wextê rastî ev be, gelo divê mirov çî bike? Bi awayekî çawan bersiva vê kesaniya rizîya sistêmê bide?

Divê ku ji bo bersivdayîna pîrsgirê-

kan û sistêmê, kesaniyê nû û azad bête amadekirin. Ji bo vê kesaniyê jî, bîrdozîya hemdemî û zanistî pêdivî ye. Belê ev tenê ne bes e. Divê rêxistin, disîplîn, fedakarî, wêrekî (cesaret), îrade, hîskirina mirovahî, hîskirina welat û azadî û wekhevî û gelek tiştên dîtir, bêne pekanîn. Ev kesaniya nû divê ku her saet û her dem xwe nûjen bike, di aliyê perwerdehiyê de xwe xurt bike û xwe ji pîsî û xerabiyên sistêmê bîparêze.

Bi kurtayî mirov dikare bibêje ye ku dibêje ku "Ez mirov im, aşîxwaz im, azadîxwaz im, demokrat im", divê li ser rewşa îro bi kûrahî birame. Encamên rast jê derxîne. Ne bes ev tenê, hemû mirovên ji vê jiyana gemar aciz, bêne ba hev, xwe bi rêxistin bikin û hemû rêxistinên demokratîk li hemberî sistêmê û qirêjiyan bikevin nava xebatê. Tu aramancên giran bêyî berdêlên giran nayên bidestxistin. Pêwist e ku kesaniyê azad û hemdem bi lez bête avakirin.



SEKRETERIYA Serkaniya Giştî ya Artêşa Tirk (Genelkurmay) di daxuyaniya xwe ya 18'ê berfanbara 1996'an de xwest ku, hunermend Ahmet Kaya bê darizandin. Sekreteriya Serkaniyê di dawiya daxuyaniyê de jî gilînameyek der barê Ahmet Kaya de ragihand Serdozgerê Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM), ji ber ew şeva 17'ê berfanbara 1996'an di MED-TV'yê de konserek daye.

Jixwe ji berê de jî, der heqê wî de ji ber hin sebebên politîk gelek dewa hatibûn vekirin. Lê Ahmet Kaya berî çend rojan li ser vê konserê da zanîn ku ew kesekî profesyonel e. û ku kî pê re peymanê çêbike ew jê re programê çêdike.



LAWÊ Kadir Keremoğlu Senar Er, (Xwediyê şirketa Vanîrê) jî bo revandina bavê xwe Wezîrê Karên Hundirîn yê berê Mehmet Ağar tawanbar (sûcdar) kir. Senar Er da zanîn ku, li ser vê bûyerê wî gilîya îtirafkar Alaattîn Kanat kiriye û li Stenbolê ew hatîye girtin. Lê tu encam jê derneketiye. Li gorî Er, sê tîmên taybet jî bo berdana bavê wî jê xûgî (fidye) xwestine û wî jî bi wan re di odeya Mehmet Ağar de hevdîtin çêkiriye.

Beramberî ku Senar Er gilîyê wan kiribû jî der heqê wan de tu tişt nehaliye kirin. Er diyar kir ku haya Mehmet Ağar û Serokê Dadgeha Harekata Taybet Ibrahim Şahîn jî vê bûyerê heye.

NÛÇE

DGM'ê zimanê kurdî nas kir

DIK

Roj rojê HADEP bi

Rojê 15'ê aşm de Meydandê Abide-î Hürriyet de "Skandala Susurluk" ser HADEP jêw mîting viraşt. Nêzdiyê 20 hezarî azayê HADEP û dostên ci ameyî pêser, vengê xo yê aşî û biratî da dinya û riye dewletê qîlêrîn teşîr kerd.

Qiseyê akêrdîni mîtingî Sekreterê Şaxê Stenbolî Cemal Çoşkun kerd. Çoşkunî vat: "Ewro Tirkiye de qisey aşî û azadî kerdiş qedexe wo, kam nê qiseyan bikiro, dewleta hema ci çekena zîndan. Nika qandê coya embazên ma yê girotxane de nî." Bado Ishak Tepey qisey kerd û vat: "Sermiyanê dewletê vanê bêbelgeyan qîşey mekirê, bewnê mi wexta ki Ferhat Tepe kişiya, min xo belgey bardî day wezîredê dewlet, la belê hetay nika tewa nêkard."

Badê nêy Azayê Parlemantoya HADEP Sırrı Sakîki qisey kerd. Ey qiseyê xo de vat ki aştiwazênê kurd û tirk ki hetanî nika kişayî, nê pêro nê çeteyan kişî, nînan miyandê aza û sermiyanê HADEP jî estê, la belê, Serokê Tirkiye Demirelî serokanê hemû partiyên veyndart, la belê serokê HADEP nêveydart, çimkî Demirel bêkişt niyo, kişta çeteyano û hem jî serokê nê çeteyan o.

Badê neya Cagêno Serokê Giştî yê HADEP Güven qisey kerdî û waşt nê şero qîlêrîn biqediyoy, fina sermiyandê dewletê re vat: "Nê şerî biqedîni, şima ki nê şerî meqedîni, no şardo şima biqedîno."

Mîtingê hunermendên NÇM'ê û Bilgesu Erenus deyrê (klamê) xo yê aşî û biratî vatî. Mîting de zaf slogan çebiyay, nînan re hebiyê ci "Mafya, dewlet, aşîret no senîn rezalet", "HADEP'a zîndan de, çeteyê meclîs de", "Çeteyan HADEP şiwena kena pak", "Şero qîlêrîn biqediyoy", "Kûtikê Türkesî nêşenî ma bitersaynê". Zaf weşê mîtingî jî wexto ki mesaja Serokê HADEP Murat Bozrak waniyê o waxt bi; çepikî cenîyay, sloganî çepiyay û zilgîti ancîya. Yanê roj rojê HADEP bi.

MEMED DREWŞ

Li DGM'ê zimanê kurdî wekî zimanekî ku zimanê ku "jê nayê fêmkirin" dihat bi navkirin û daxwaza wergêrê zimanê kurdî dihat redkirin û cezayên giran li wan dihatin birîn. Lê DGM'ê dev ji wê helwesta xwe berda û yekemîn car ji bo wergerandina kaseteke bi kurdî, di 12'yê berfanbara 1996'an de ji Weqfa Lêkolîn û Çanda Kurdî wergêr xwest.

Heya îro zimanê kurdî, li mehke-meyan zimanekî ku "jê nayê fêmkirin" bû. Li gorî hinekan jî zaravayekî zimanê tirkî bû. Ji 2-3 hezar peyvên pêk dihat, ku ew jî bi piranî ji tirk, farisî û erebî wergirtibûn. Profesoren tirk "Gelo di zimanê kurdî de bi qasî ku têrî nivîsandina romanekê bikin, peyv hene?" digotin.

Heke em hinekî din biçin rojên berê, wê bê zanîn ku ji ber her peyvên bi kurdî, ceza dihatin standin. Gundiyên kurd ev rewş bi pêkenokên xwe rexne kirine û ev sosretî xistine nava zargotina kurdî jî. Zarokên kurd ji malên xwe bi darê zorê dihatin berhevkerin û li dibistanê bi navê "Yatılı okul" dihatin hêvotin. Di sinifan de ji bo ku zarok li malê jî bi zimanê xwe nepeyivin "kürtçe kolu başkanları" hatibûn hilbijartin.

Mirovên ku di van dibistanan de dihatin hêvotin (terbiyekirin), ji nasnameya xwe û zimanê xwe şerm dikirin. Heta hin kurdên ku nikaribûn wekî tirkan bipuyivin, ketin nava kompleksê û xwe kuştin. Lewre tevî hemû hewldanan jî nikaribûn kurdbûna xwe veşêrin.

Li aliyê din kesên ku dev ji nasnameya xwe bernedidan jî, dihatin cezakerin. Bi dehan rewşên birên kurd ji bo ku bi zimanê xwe berevaniya (mudafa) xwe kirine hatin girtin. Apê Mûsa ji ber ku bi zimanê kurdî "fikandibû" hatibû girtin. Mînakeke ku her kes pê dizane jî Vedat Aydın bû.



BANA KURDÎ

Piştî Tevgera Azadiyê digel kêşaya kurdî, pirsgerêka zimanê kurdî jî hate rojevê, di 1991'ê qedexeya li ser axaftinê hate rakirin, lê pê nivîsandin û xwendin qedexe ma. Rewşên birên kurd dest birin xwe û di sala 1992'an rojnameya bi navê Rojname, pişt re jî Rojnameya Welat derxistin. Lê tevî ku zimanê rojnameyê bi kurdî bû jî, mirovên ku ji ber nivîsên bi kurdî dihatin darizandin (mehmekemkirin) nikaribûn bi zimanê kurdî berevaniya xwe bikirana. Daxwazên wan dihat redkirin.

Berpirsê Karên Nivîsaran ê Welat Mazhar Günbat bi kurdî berevaniya xwe kir, lê wekî ku îfade nedabe hate cezakerin. Her wiha Berpirsê Karên Nivîsaran ê Welatê Me Mehmet Gamsiz, ji ber ku bi kurdî îfadeya xwe da, hate girtin û meh û nîvekê di girtgehê de ma.

Li DGM'ê zimanê kurdî wekî zimanekî ku zimanê ku "jê nayê fêmkirin" hate bi navkirin, daxwazan wan kesana ji bo wergêrê bi kurdî hate redkirin û cezayên giran li wan hatin birîn. Lê em îro pê dihesin ku DGM'ê ji bo wergerandina kaseteke bi kurdî di 12'yê berfanbara 1996'an de ji Weqfa Lêkolîn û Çanda Kurdî (KÛRT-KAV) wergêr xwestiye. Ew tê wê wateyê ku DGM zimanê kurdî nas dike. Kasetaya ku der barê wê de doz hatiye vekirin a Şehrîbana Kurdî û jî "Sevkan Plak ve Kasetçilik" ve hatibû derxistin. Navê kasetê "Yek du sê" ye.

DGM, yekemîn car li ser daxwaza Parêzer (ebûqat) Hatip Mercan bi awayekî fermî ji bo wergerandina materyalên bi kurdî, serî li saziyeke kurdî dide. Heta niha materyalên bi kurdî ji layê polîsan ve dihatin wergerandin, wan li



gorî dilê xwe ev kar dikir. Her wiha li dadgehan dema yekî bi tirkî nizanibûya, yan mûbaşîrekî, yan polîsekî yan jî leşkerî wergêrî dikir.

Ji ber girîngiya vê bûyerê me dîtinên Serokê KÛRT-KAV'ê Yılmaz Çamlıbel jî pirsîn. Çamlıbel guherîna helwesta dewleta tirk bi rewşa ku Tirkiyeyê ve girê da ku ew li qada navneteweyî ketiye tengasiyê û her wiha bi xebata 98 rewşên birên kurd ve ku KÛRT-KAV ava kirine, girê dide û dibêje: "Ji ber pesta raya navneteweyî dewlet politîkayên xwe yê li hemberî kurdan nerm dike û rê li ber xebatên legal nagire."

Li ser pirsê me ya bi rengê "DGM'ê çima serî li KÛRT-KAV'ê da, lê serî li saziyeke din a kurd neda?", Çamlıbel ev bersiv da: "Ew yek bi daxwaza parêzeran ve girêdahî ye, heke parêzer pêşniyaza wergêrê jî saziyên din ên mîna Enstîtuya Kurdî û NÇM'ê bike, ez bawer im DGM'ê dê ji wan jî wergêr bixwaze."

Yılmaz Çamlıbel got ku wan berê agahî dane Wezîriya Edaletê û Yekîtiya Notêrên Tiriyeyê ku ew karin wergêrên zimanê kurdî ji wan re temîn bikin. Her wiha ji bo destûra kursên bi zimanê kurdî jî wan serî li Walîtiya Stenbolê daye. Çamlıbel serîlêdana DGM'ê wekî encamê van çalakiyan destnîşan dike.

Li aliyekî ev qewimîn, li aliyê din rapora MGK'ê ku tengavkirina HADEP'ê û rêxistinên mafên mirovan dixwaze û hewlên ji bo girtina MED-TV'yê. Lewre jî divê mirov bi hendaze nêzikahiyê bi vê helwesta DGM'ê bide.

SAMÎ BERBANG/MAZLÛM BAZ

Çend nîşe li ser pirtûka

Di pirtûka xwe ya bi navê "Hindek aloziyên zimanê kurdî (Kurmançî)" de Mamoste Deham Evdilfetaş, hin peyv û tîgîn digire dest û tevliheviya di warê bikaranîna wan de ji holê radike. Her wiha ew li ser hinek xalên rêzimanî jî radiweste û çewtiyên hefî sererast dike. Digel vê yekê, li gorî dîtina min, hin xalên şaş jî di pirtûkê cih girtine.

Mamoste Deham Evdilfetaş pirtûka xwe ya bi navê "Hindek aloziyên zimanê Kurdî (Kurmançî)" ji me re hinartîye. Di vê pirtûkê de li ser gelş û aloziyên zaravayê kurmançî gelek agahiyên heja hene.

Mamoste, hin peyv û tîgîn digire dest û tevliheviya di warê bikaranîna wan de ji holê radike. Her wiha ew li ser hinek xalên rêzimanî jî radiweste û çewtiyên hefî sererast dike.

Wekî mînak, tîgînên rêzimanî wekî tîpên "dengdêr û dengdar ji hev derdixe û diyar dike ku her wekî Mîr Celadet Bedirxan jî destnîşan dike, divê dengdêr ji bo tîpên ku bi erebî "huruf-ul sewtiye", bi îngilîzî "vowel", bi tirkî "sesli" dibêjin, be.

Dengdar jî divê ji bo tîpên ku bi erebî "huruf-ul semtiye", bi îngilîzî "constant" û bi tirkî jî "sessiz" dibêjin, bê bikaranîn. Mamoste dide zanîn ku her du tîgîn jî hevedudanî ne, yek ji deng-dêr, ya din ji deng-dar tê. Her wekî tê zanîn parkîta "-dar" wateya xwedîtîyê dide peyvê, lê partîka "-dêr" ji dêrandîne tê, ew dengê hefî didêrine ango peyvê ji derê digire û belav dike. Her wiha mamoste, mijara hevokên navdar û hevokên lêkerdar ji hev derdixe. Dide zanîn ku di kurdî berevajî gotina Mîr Celadet Bedirxan hevokên navdar hene û xurdebêjên ku tîgîn dawîya navdêr û lêkeran wekî; (-im, -î, -e, -in) tu tîkiliya wan bi lêkera bûnê tune ye, lewre ew tîgîn dawîya lêkerê bi xwe jî, wekî: ez bû-m, tu bû-yî, ew bû û em, hûn, ew bû-n.

Digel agahiyên wiha heja, li gorî dîtina min hin şaşî jî di pirtûkê de cih girtine. Min divê ez li ser van mijaran rawestim.

Cinavkên şanîdanê (cinavkên îşarkî)

Li gorî mamoste Deham Evdilfetaş di zaravayê kurmançî de cinavkên şanîdanê bi tenê "ev û ew" in, dema ev ditewin, dibin evî, evê, evan, ewî, ewê, ewan. Lewre jî ew dixwaze ku cinavk wekî "vî, vê, wî, wê, van, wan" neyên nivîsandin. Celadet Bedirxan li ser vê mijarê wekî mamoste difikire, bes sedemeke çada diyar dike. Li gorî C. Bedirxan divê "e" ya serê peyvê nekeve ji bo ku tevlihevî çênebe, cudatî hebe di navbera cinavkên şanîdanê û yên kesane de. Lê ew bi xwe di gelek nivîsên xwe de jî vê qeydeyê avarê bûye. Hin caran evî, evê, evan... gotiye hin caran jî "vî, vê û van..." gotiye. Divê ez bibêjim ku ev awa zêdetir tevliheviyê çêdike, lewre mijara tewangê

li hin deverên Kurdistanê çewt cih girtiye, dema ev her du cînavk jî hev ne cuda bin, ji holê rakirina aloziyê gelekî dijwar dibe. Gelek kes hene ku dibêjin "Eva dibîne, evana dibînin, ewana diçin..."

Kamîran Bedirxan vê mijarê bi awayekî din rave dike û dibêje ku di zaravayê kurmançî de her wekî bernavên kesane, yên şanîdanê jî du bir in, wekî; bira yekem: "Ev, Ew" û bira duyemîn "vî, vê, van, wî, wê, wan." Bi dîtina min jî ravekirina Kamîran Bedirxan rastir e. Lewre di zaravayê kurmançî de du bir bernav hene, birê xwerû û yê tewandî. Di vî warî de zaravayê kirdkî (zazakî) gelekî dişibe zaravayê kurmançî di vî zaravayê me de jî du bir bernavên hene, wekî;

Ez vana (ez dibêjim)

Mi vat (min got)

Bernavên şanîdanê (li gorî devoka Çermûgê)

Ney mordemî vat (vî mirovî got)

No mordemo vano (Ev mirov dibêje)

Na bizê werd (vê bizinê xwar)

Niwo biz weno (ev bizin dixwe)

Nivîsandina pênasî kesa

Her wekî me gelekî dîtîye ku li rûpelê pêşîn ên pirtûkê hatiye nivîsin; "Ji apê Reşîd re, ji xwişka Zînê re, ji meta Rewşenê re". Mamoste Deham Evdilfetaş li ser vê mijarê jî radiweste û balê dikişîne çewtiya vî awayî. Lewre wateya ku ji hevokê diçe û mebesta kesê ku ew gotin nivîsiye li hev nakin. Dema yek dibêje ji apê Reşîd re mebesta wî ne kesekî din, lê Reşîd bi xwe ye. Bi dîtina min ew dixwaze bibêje; Ji apê min Reşîd re, lê ew "min" ketiye. Mamoste diyar dike ku divê wekî, Ji ap Reşîd re, ji xwişk Zînê re, ji met Rewşenê re be. Bi dîtina min jî ev yek duristir e. Lê li gorî mamosteyê heja, mirov kare bibêje; Apo Reşîd, Xwişk Zînê û metê Rewşen. Ez ne di wê baweriyê de me, ji ber ku parkîten "-o", "-ê" ji bo baneşanê ne, lewre jî mirov kare bibêje, "apo!", "Reşîdo!", "xwişkê!", "metê!", "Zînê!", "Rewşenê!", lê nikare bibêje "apo Reşîd", "xwişkê Zînê", "metê Rewşenê".

'Dî' an 'din'

Mamoste Deham li ser peyv 'dî' û 'din' radiweste û digel hin agahiyan dide zanîn ku 'dî' rastir e. Li gorî mamoste ev yek dema mirov wê peyvê bi derece dike, diyar dibe. Her wekî çawa em dibêjin "baş, baştir" em dikarin bibêjin "dî, dîtir" bes em nikarin bibêjin "dintir", li aliyê din peyvê dîsan bo nimûne dide, lewre ev peyvê jî du hemanan pêk hatiye, 'dî' û 'san'.

Deham Evdilfetaş



Deham Evdilfetaş

Lê di vî warî de aliyekî din balê dikişîne, Mîr Celadet Bedirxan di kovara Hawarê de li ser peyvê "hev" disekine û dide zanîn ku ew peyvê "yew" a kirdkî hatiye, yanê wateya wê ji yekê pêvetir ne tiştek e. Dîsa 'dî' cihê 'hev' de, 'êk' jî tê bikaranîn, bo nimûne dibêjin "êk û dî dinasin". Heke 'hev' û 'êk' ji hejmara yek hatibin, gelo 'din' an jî 'dî' ji ku tîgîn? Li gorî baweriyê min ew jî ji xeynî hejmara 'du' ne tiştek e. Lewre li hin deveran dibêjin, "hev û du" an jî "êk û du".

Digel vê rastiyê di zimanê îngilîzî de "each-other" dibêjin, "each" bi xwe 'yek' e û "other" jî di îngilîziya kevn de 'du' ye. Dîsa di zaravayê kirdkî de "yew û bîn" tê gotin. Ji bo peyvê "din" jî lêkolînek li ser forma kevn a hejmara 'du' pêwîst e. Her wiha dibe ku ji dereceya herî bilind a 'dî' "dîtirîn" hatibe, ji ber ku li cihê 'din', 'dîn' jî tê gotin. Li aliyê din kîjan form rast be jî, bi dîtina min mirov kare wan digel hev bi kar bîne, zêde tevliheviyê çênake.

Gelo zayenda kengî/ê heye?

Mijareke din a ku mamoste hildaye dest, mijara zayendan e. Di vî warî de bi tenê tiştekî bala min kişand ku bi min hinde rast nehat. Lewre mamoste li ser zayenda hinek peyvên disekine ku li serê lihevkiyê nîn e, lê li wir wekî mînak peyvê 'kengî' jî dide. Li gorî zanîna min 'kengî' hokera pirsîyarî ye û tê gotin ku hoker ji birên qîsetê yên neguhêrbar in. Bes tiştek din heye, wekî dî hejmareke Azadiya Welat de mamoste Zana Farqînî diyar kiribû, peyvê kengî peyveke hevedudanî ye.

Li gorî ravekirina mamoste Zana, ji du hemanan pêk hatiye; çî û heng, bi dîtina min dibe ku ew 'kîj' û 'heng' be. Lewre li hin deveran "kî çax" û "çî çax" tê bikaranîn. Li vir "-heng" navdêr e, demekê nîşan dide, lewre jî li gorî zayendê ditewe, yanê mirov kare bibêje "çî hengê", "çî hengî" bersiva wê jî dibe, "vê hengê" yan jî "vî hengî".

Tîpa "w"yê çima tê pêşiya "ê"ya dema bê?

Mamosteyê hêja Deham Evdîlfetah bi-karanîna peyva "wê" di dema bê de rast nabîne, li gorî baweriya wî, ew "w"ya serî ji çinavka "ew"ê tê. Yanê mirovan pêşî gotinê "ewê were", paşê ew peyv bûye "wê were" wisa bi xeletî cih girtiye. Lê bi dîtina min berî ku mirov li ser wê peyvê tesbî-teke wiha bike, divê mirov lêbikole ka raweya dema bê çawa çêbûye di zaravayê kurmançî de. Digel peyva "wê" ji bo dema bê, "dê" û "ê" ji tê bikaranîn. Dema mirov bala xwe dide van xurdebêjan, tê dîtîna ku ew giş ji lêkera "hatin"ê tîn. Em baş dizanin di dema niha de, lêkera hatin dibe "dihê", lê paşê ew dagiriyaye bûye "tê", bes li vir tîpa "d" wekî xwe maye. Ji wir "dihê bike" bûye "dê bike", heke xurdebêja "di"neyê pêşiya "ê"yê bi tenê dimîne û "ê bike" tê gotin. Jixwe em dizanin ku li herêmine Kurdistanê xurdebêja "di" nayê xebitandin, li şûna "ez dihê" dibêjin "ez êm". Her wiha di zaravayê kirdkî de ji xurdebêja "di" nîn e, ew dibêjin "ez yêna" yanê ez tîm. Li vir divê ez qala formeke din a dema bê ji bikim ku ew ji "ez dikim..." e, tê gotin ku "ez dikim herim". Ji aliyê wateyê ve forma "ez dikim herim" nêzî "I going to go" ya îngilîzî ye. Li gorî baweriya min awayê pêşîna dema bê perisîneke wiha derbas kiriye: "Ez dihê werim", "ez dê werim". Heke em vegerin ser mijara xwe, dema peyva berî wê bi tîpeke dengdêr biqede, tîpên peywendiyê tîna seriya "ê", tîpên peywendiyê jî di kurmançî de sê heb in; "y, w, h". Bo nimûne peyva rû li hin deveran wekî "rûyê min", li hin cihan jî "ruwê min" tê gotin.

Bikaranîna veqetandekan

Li ser mijara veqetandeka nebinavkirî (zêdera nependî) ya gelemperî birêz Evdîlfetah awayên taybet pêşniyaz dike, li gorî wî dema rengdêrê piştî navdêreke ne-

navkirî ya gelemperî were veqetandeka "dîvê bibe" "-inî" bo nimûne divê mirov bibêje "hespînî qenc". Lê bi dîtina min tîpa "î"yê li wê derê ji bo tewangê ye û bi tenê piştî navdêrên nêr ên nebinavkirî tê xebitandin, yanê mirov kare "hespînî qenc" bibêje, lê di kurmançî de gelemperî veqetandekên zayendê nagirin. Li gorî C. Bedirxan awayê rast "hespine qenc" e, her wiha bi ihtimaleke mezin dengê "n"yê ji dawîya "ine" ketiye, lewre jî forma rastir "Hespînen qenc" e. Dîsa ne dîrî aqil e ku ew ji veqetandeka binavkirî "-ên" hatibe. Lewre li hin deveran "Hespînen qenc" jî tê gotin. Ji bo ku mijar baştir were fêmkirin, divê ez bi bîr bixim ku ew "-in" ji "hin"ê tê. Dema em bi "hin"ê kar bikin, em dê bibêjin "hin hespîn qenc". Her wiha bersiva pîrsa "hin hespîn çawa?" wê bibe "hinên qenc". Li hin deverên Kurdistanê tê gotin "avîne", "nanîn" bidin min, bes ew form bi gelemperî ji bo tiştên ku nayên hejmartin e û herêmkî ye.

Wekî dîmahîka vê mijarê, mamosta di-de zanîn ku dema du rengdêr li pey hev werin mirov kare tîpa "î"yê ji bo navdêrên mî jî bi kar bîne. Bo nimûne li gorî mamoste rast e ku yek bibêje "Bizina min î kol" dema bixwaze bide zanîn ku bi tenê yek bizina wî heye. Li xuya ye ku rengdêr ji birên qisetê yê neguhêrbar in, lewre jî çend heb li pey hev bîn jî, veqetandeka ku were rewşa navdêrê bi xwe nîşan dide. Di hevoka jorîn de her du veqetandek li hev nakin. Bes li wê derê heke mirov bixwaze, teke-nebûna bizinê nîşan bibe, mirov kare bilêv-kirinê wê nîşan bide yan jî veqetandeka duyemîn bi rengdêrê ve bike, wekî "bizina mina kol"

Wekî encam, ez dixwazim li ser pêrkîta neyînkirinê ya rawaya fermanî çend tiştan bibêjim. Li gorî momaste Deham di kurmançî de pêrkîta neyînkirinê ji bo rawaya fermanî "ne-" ye, yanê neyîniya "bike"yê "neke" ye. Dîsa ew diyar dike ku li hin deverên welatê me cihê "ne-"yê "me-" digi-



re, wekî "meke, meçe, mede". Li gorî mamoste li vir tîpa "n"yê bi "m"yê guheriye, ev awa devokî ye û divê neyê bikaranîn. Bes tê zanîn ku dîroka devokan ne ew qas kûr û dûr e, lê em bala xwe didinê ku li hin deverên Kurdistanê "neke, neçe, nede" qet nayê zanîn, her wiha di zaravayê kirdkî de

jî awayê bi "me-"yê heye, wekî "mebere (mebe)", "meke", mevaje (mebêje)" û hwd. Di dawîya nivîsa xwe de min divê bidim zanîn ku ev çend mijarên ku ez ne pê re me, ji hêjahiya pirtûkê tiştêkî kêr nake. Min bi xwe gelek sûd ji vê pirtûkê wergirt. SAMÎ BERBANG

Bêtara mezin

CELALETTİN YÖYLER



Gele xwendevanên birêz, ez dixwazim vê nivîsa xwe, di bin vê sernavê hanê ku di nav gelê kurd de tê xebitandin de binivîsim. Belê gelê kurd dema tiştine ne xweş tîne serê yekî, dibêje: "Xwedê me ji bêtarên giran biparêze." Ev jî peyveke banzûrî û xwespartinî ye. Ango ewên ku tiştine nexweş bi serê wan de tîne, ew banzûrê Xweda dibin û dixwazin xwe bi alîkariya Xweda ji bêtar û teşqeyan bidine parastinê. Bi zanîna min, ev hem dîtineke çewt, hem jî rast e.

Çewtiya wê ew e ku banzûrê Xweda dibe û xwe li hemberî bûyeran bêhêz dibîne û xwe ker dike. Rastiya wî jî ew e ku dizane heyîneke serdestî hemû heyînan heye. û dixwaze wî jî bêtaran beparêze. Lê راستiya bi zanyarî û xwenasî ew e ku mirov li hemberî bûyerên şeytanî û bédadî amade be, serî hilde û xwe biparêze. Ne ku xwe ker bike û bibêje:

"Xweda tu me biparêzî." Lewre Xweda bi xwe jî ji mirovan re dibêje: "Li hemberî her bûyerên ku tu dizanî wê bêne serê te, jê re amade be, xwe biparêze. Dûre xwe bispêre parastina min." Gelî birayên min ên hêja û birêz, ka carekê çavên xwe li rewşa gelê çîhanê û li timtêla gelê xwe yê reben bigerînin û bi hûrbîni rewşê analîz bikin. Wê demê hûnê bibînin ku, rewşa gelê me wekî rewşa tu kesî di çîhanê de nîn e û pir cuda ye. Lewre em di nav nexşeya (xerîte) Rohhilata Navîn de, nêzikî pîncî milyon kes in. Lê hê bê "al" û "êl" in. Ev jî bêtaran herî mezin e bi serê me de hatiye.

Divê em baş bizanin ku bêtarên pir mezin di her çar parçeyên welatê de bi dijwarî bi ser me de tîne xwarê. Em dibînin ku çeteyên kontrayî, li Tirikiyeyê her ji bo kuştina me hatine avakirin û amadekirin. Belê bi rastî van gemaran, her ji bona ku gelê kurd dibin destê wan de kole û dîl bimînin, çiqas dezgehên wan ên şeytanî û nemirovî hene, xebitandine. Lê ez bi baweriya xwe ya derûnî û olî dibêjim, keşên ku wekî "me kurdan" tîne kuştin, zêrandin, heke xwe nas bikin û li hemberî kirinên hovane serî hildin û serê xwe ji wan re netewînin, Xweda alîkarê wan e. Bi rastî Xweda alîkarê mazlûman e, çî dema ku mezlûm xwe nas dikin û li her deverên çîhanê dikine qîrîn û dibêjin: "Bes e dagirker! Te, pir

bêtarên giran anîn serê me mezlûman. Lê em êdî bawer in ku ew bêtar wê bêna serê we dagirkeran."

Bi zanîna min niha bêtaran pir mezin li serê "rejîma kontrayî" ye. Lewre rûyê wê yê gemarî hatiye eşkerekirin û diyar bûye ku, wê di nav raya şoreşger û demokratên hemdem ên navneteweyî de bêne lanetkîrin û şemazarkirin. Lewre "kumê keçel ketiye û keçeliya wî xuya bûye. Hem jî qul lê fireh bûye, êdî pîne nagire." Belengazî û şewat û talanbûna gelê kurd ê reben êdî xenimî wan bûye. Li aliyekî sendroma leşkerî, li aliyê din, "tebayê" enflasyonê; devê xwe vekiriye û êrîşî ser rejîma kontrayî dike û jê re dibêje: "Ey bêşermê bêfedî, ezê te bixwim û dabelînim. Lewre te li xwe heq kiriye ku ez te dabelînim. Te trilyon û katrilyon di rîya kuştina bi hezaran kurdên reben de xerc kirine." Ji bo ku tu her koledar û dagirker bimîni! Lê pir mixabin te bi van tevgerên xwe yê gemarî, bi milyonan karker û karmend û gundiyan reben jî bi gemariya xwe re birçî û belengaz kirin! Tebayê enflasyonê bi zimanê xwe yê halî jî rejîmê re dibêje: "Tu hê jî dijimin tebatirî, lewre ez birçibûn û hejariyê diaferînim. Lê tu hem xwîne dirijîni, hem jî bi hezaran dil û kezabên bav, dayikan dişewitni."

Anketa xwendevanên Azadiya Welat

Hûn çend salî ne:

Tehsîla we:

Karê we:

Hûn niha li ku rûdînin?

Hûn ji kengê ve bi kurdfî dixwînin?

Hûn çiqas bi kurdfî dizanin?

- Dixwînim
- Dinivîsim
- Hem dixwînim, hem dinivîsim

Zimanê we yê zikmakî kîjan e?

Hûn ji kengê ve bi kurdfî dizanin?

Hûn ji kengê ve Azadiya Welat dixwînin?

Hûn ji xeynî kurdfî bi kîjan zimanên din dizanin?

Hûn Azadiya Welat her hejmar dixwînin?

- Erê
- Carinan

Hûn Azadiya Welat bi çi awayî (ji ku) distînin?

Hûn zimanê rojnameyê çawa dibînin?

- Hêsan (rehet)
- Dijwar (zor)

Hûn kîjan rûpelên rojnameyê dixwînin?

Hûn pêşî li kîjan rûpelan dinêrin?

Hûn kîjan rûpelan get naxwînin?

Hûn bi kîjan zaravayên kurdfî çiqas dizanin?

- Kurmancî**
- Fêm dikim
 - Dixwînim
 - Dinivîsim

Kirdkî (zazakî)

XWENDEVANÊN HÊJA

Di vê anketa me de du celeb pirs hene. Yên li ku hemberî wan an jî li bin wan cihê bersivê vala ye, jî bo dagirtina we ye. Cureya duduyan jî pirsên ku li bin wan çend bersiv hene, divê hûn çeperastekê (çeprazekê) deynin pêşiya yekê an jî çend heban ji wan. Bi saya vê anketê, em difikirin ku li gorî daxwaz, hevî û rexneyên we kêmasiyên rojnameyê jî navê rakin û jî bo rojnameyê xweşik û hêjatir guherînan pêwîst çêkin. Berî guherînan emê enca ma anketê jî pêşkêşî we bikin. Piştî dagirtina anketan, hûn dikarin rûpela anketê bibirin an jî fotokopiya wê bikişînin û jî me re bi lezgîni bişînin.

- Fêm dikim
- Dixwînim
- Dinivîsim

Kurmanciya jêr (sorani)

- Fêm dikim
- Dixwînim
- Dinivîsim

Li gorî we zimanê kîjan nivîskarên Azadiya Welat sivik û hêsan e

Bi ya we zimanê kîjan nivîskarên me giran e?

Hûn dixwazin di Azadiya Welat de kîjan nivîskar hebin?

Li gorî we zimanê nûçeyên me çawa ye?

- Sivik e
- Giran e
- Baş e

Di rojnameyê de hûn pirtir kîjan nivîsan dixwînin?

- Ên li ser zimên
- Ên li ser çand û hunerê
- Nivîsên quncikan
- Nûçeyan
- Hevpeyvînan
- Nivîsên mîzahî
- Nameyên xwendevanan
- Nivîsên ji bo zarokan
- Helbest
- Nivîsên lêkolînî

Ji van mijaran hûn kîjan get naxwînin?

- Ên li ser zimên
- Ên li ser çand û hunerê
- Nivîsên quncikan

- Nûçeyan
- Hevpeyvînan
- Nivîsên mîzahî
- Nameyên xwendevanan
- Nivîsên ji bo zarokan
- Helbest
- Nivîsên lêkolînî

Hûn xaçepirsê çêdikin?

- Tenê peyva veşarî dibînim
- Carinan çêdikim
- Her tim çêdikim
- Qet çênakim

Cihê ku em ji nameyên xwendevanan re vediqetînin:

- Pire
- Hindik e
- Baş e

Bi ya we zimanê Azadiya Welat bi giranî:

- Botankî ye
- Xerzankî ye
- Torankî ye
- Serhedkî ye
- Amedkî ye
- Kurdistanî ye

Hûn kîjan aliyên Azadiya Welat xurt (baş) dibînin?

Hûn kîjan aliyên Azadiya Welat qels dibînin?

Li gorî we nivîsên Azadiya Welat:

- Kurt in
- Dirêj in
- Baş in

Di Azadiya Welat de nûçe (xeber)

- Hindik in
- Pir in
- Baş in

Ji bilî Azadiya Welat hûn kîjan weşanan (rojname û kovar) dixwînin?

Hûn kîjan weşanan dicibînin?

Azadiya Welat gerek e:

- Dîsa hefteyî derkeve
- Bibe rojane
- Bibe duhefteyî
- Bibe mehane

Di Azadiya Welat de nivîsên bi kirdkî û kurmanciya jêr:

- Hindik in
- Pir in
- Bes in

Hûn dixwazin ku di Azadiya Welat de bêhtir kîjan mijar hebin?

Hûn siyaseta weşana Azadiya Welat çawa dibînin?

Di xwendina Azadiya Welat de çi tengasiyên we hene?

Hûn bihayê rojnameyê çawa dibînin?

- Erzan e
- Biha ye
- Baş e

Ji bilî we çend kesên din ji rojnameya ku hûn distînin, istifade dikin?

Hûn rojnameyê ji malîyên xwe re dixwînin?

- Erê
- Na
- Carinan

Divê ferhengok di rojnameyê de:

- Hebe
- Tûne be
- Hebe û cihê wê firehtir be

Raman û nêrinên we yên din hebin li jêrê binivîsin:



● 24.12.1978

Qetlîama Mîraşê, di 19.12.1978'an de bi dînamîkirina "Çiçek Sineması" dest pê kir. Armanca vê qetlîamê ji navê rakirina alewîyan; bi taybetî, yên kurd û muxalefeta çepgir bû. Provokatorên ku ji sinemayê derketin, pêşî avahiya CHP'ê û PTT wêran kirin. Di 20'ê mehê de wan qehwexaneyê bi navê "Akın" bombe kirin. Di 21'ê mehê de du mamosteyên endamê TÖB-DER'ê (Komela Yekîtiya Mamosteyan a Tirkîyeyê) bi navê Hacı Çolak û Mustafa Yüzbaşıoğulları kuştin. Faşîstan di 22'yê mehê de êrîş birin ser merasîma cenazeyên mamosteyên ku kuştibûn. Di 23'ê mehê de qetlîam gihişt radeyeke bilind. Êrîşên ku li

hemberî alewî û çepgirî hatibûn plankirin, çêbûn. Di nava van şêş rojan da bi sedan dikan û malên li nava bajêr hatin şewitandin û rûxandin. Bi dehan mirov jî bi awayekî hovane hatin kuştin. Bersûcê yekemîn ê qetlîamê mebusê Mîraşê yê ji BBP'ê (Partiya Yekîtiya Mezin) Ökkeş Kenger bû ku paşnavê xwe wek Şendiller guhert. Ji bilî wî serokê ÜGD'ê (Komala Ciwanên Ulkuciyên) Mehmet Leblebici û cîgirê wî Mustafa Karlıdere du kesên bikuj (qatîl) in. Her çiqas ev qetlîam bi destê rêxistinên nijadperest MHP'ê (Partiya Tevera Netewekar) û şaxa ciwanan a wê partiyê ÜGD'yê çêbû jî, berpîrsên qetlîamê yên rastî sermayedarên tirk bûn. Qetlîam bi handana wan çêbûbû.

AWIR

Hawara Aştiyê

Parêzer Engin Cinmen diyar kir ku, ew niha bextewariya "me negotibû"yê dijîn. Cinmen got: "Çavkaniya kirêtîyên ku bi Bûyera Susurlukê derket holê, şerê li Başûrê Rojhilat e." Her wiha ew li ser çalakiyên aborî yên artêşa tirk jî rawestîya, eşkere kir ku ew bûye pawan (monopol) û ketiye borsayê.

IHD 'ya Stenbolê, di Hefteya Mafên Mirovan de li ser mafên mirovan û aştiyê çalakiyên wekî şevbuhêrkên helbestan, konser, forum û panel li dar xistin. Her wiha filmên li ser mafên mirovan hatin nîşandan û pêşangêhên karîkatur û wêneyan hatin vekirin.

Di 15'ê berfanbarê de li Otela Hiltonê bi rêveberiya ebûqat (parêzer) Engin Cinmen bi navê "Me şer navê, aşti mafek e" forumek hate lidarxistin. Forum bi beşdariya Cîgirê Serokê Sine-senê Yûsuf Çetin û hunermed Orhan Günşiray, Parêzer Eren Keskin, sendikavan Munzur Pekgüleç û Atilla Ayçin, Serokê KÛRT-KAV'ê Yılmaz Çamlıbel, Lêgerîner Osman Ergin û Rojnamevan Fehim Işık pêk hat.

Di forumê de bi taybetî li ser nêzîktêdayîna çepgirî a li hemberî çînên serdest û hevkarîya hêzên çepgir hate rawestîn. Her wiha helwesta medyayê ya li hemberî aştiyê jî hate nîrxandin.

Parêzer Engin Cinmen di axaftina xwe de li ser rûdanên dawî û çalakiyên kontrgerîla rawestîya. Wî diyar kir ku, ew niha bextewariya "me negotibû"yê dijîn. Cinmen wiha gotina xwe domand: "Çavkaniya kirêtîyên ku bi bûyera Susurlukê derket holê, şerê li başûrê Rojhilat e. Kî dibe bila bibe, yên ku dixwazin 'Bûyera Susurlukê' ronî û zelal bikin divê em alîkariya wan bikin." Her wiha Cinmen li ser çalakiyên aborî yên artêşa tirk jî rawestîya û diyar kir ku, tu artêşên wekî artêşa tirk li dinyayê nîn in. Wî da zanîn ku ew bûye pawan (monopol) û ketiye borsayê.

Serokê KÛRT-KAV'ê Yılmaz Çamlıbel di axaftinê xwe de bi taybetî li ser pîr-nasnametîya mirovan rawestîya û got: "Nêzîktêdayîna serdestîya nasnameyekê tu pîrsgirêkan çareser nake.

'Em hemû tirk in, em hemû misliman in, em hemû kurd in', nêzîktêdayîneke xelet û teng e." Li gorî Çamlıbel her çiqas dewlet wekî dewleta burjûva xuya bike jî, burjûvazî wê bi rê ve nabe. Her wiha Çamlıbel diyar kir ku, çîna karêran û burjûvazî aştiyê dixwazin, lewma divê ew ji bo aştiyê hevkarîyê bikin.

Sendikavan Munzur Pekgüleç, li ser pêwistî û girîngiya hevkarîya hêzên aştiwaz û çepgirî rawestîya û got: "Divê em êdî nêzîktêdayîna 'yê herî rast ez im' biter kînin. Her kes dizane çî bike. Lê, em nikarin werin cem hev." Pekgüleç jî bo hevkarîya bi çînên serdest re jî wiha got: "Qirêjî bi destên qirêjî nayê paqijkirin."

Ebûqat (Parêzer) Eren Keskin jî li ser pêwistîya hevgerîna û hevkarîyê rawestîya û xuya kir ku ewê her tim li benda kesên din be. Piştî re jî wê got: "Kurdan pêwistîya aştiyê fêmkirîye. Divê em vê yekê bi tirkan bidin fêmkirin" Keskin li ser kuştinên ku failên wan nediyar in jî wiha got: "Gava ku Medet Serhat û Savaş Buldan hatin kuştin, jinên wan Tefvik Ağansoy destnîşan kirin. Lê dozger tirsîn û lêpîrsîneke dorfireh çênêkirin. Vedat Aydın jî dema ku Hüseyin Kocadağ Midûr Emniyeta Amedê bû hate kuştin."

Lêgerîner Osman Ergin jî bi piranî li ser helwesta medyayê rawestîya got ku medya neguherîye, hê jî ser qirêjîyên sîstem digire.


Ergin li ser hevkarîya kedkarên tirk û kurd sekîn û wiha got: "Tîrsa dewletê ya herî mezin yekbûna kedkarên kurd û tirk e. Di 1 Gulana 1996'an de dewletê ev yek dît û provakasyon pêk anî, medyayê jî ev rûdan paşçav kir."

Ji ber xwepêşdana HADEP'ê û Kongreya Enstituya Kurdî hejmara beşdaran hindik bû, forum bi axaftina gundiyekî kurd qedîya. Wî jî serpêhatiyên xwe yên şer anîn zimên.

EŞREF SÎDAR

ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YİÇÎT



Peyvên pêşîyan

Desthilanîn fereca xêrê ye. Rih dibe bost dijimin nabe dost. Serê ku neşkê bêxêr e. Serê bênamûs naçe bihuştê. Tirsonek tim li paş in. Serê kesê rast tim bilind e. Derew tim mala xwediyê xwe xerab dikan.

Ev çend peyvên pêşîyan in ku bav, ap, xal û rihspîyên me kurdan nas dikan û di civat, meclîs û odayên gundan de, li ser riyên bajêr, aş û êzingan, li berberojk û siha mizgeftan gava ku pêwîst be û cihê wan tê, dibêjin.

Peyvên pêşîyan peyvên mirovên kevn in. Cil û nîşên berî me ew ji me re hiştine. Edebiyat û folklorê her neteweyî cihekî xurt dide van peyvên.

Pir caran serpêhatiyek, tecrûbeyekê kûr, dûr û dirêj dibe hevokê di gotinên pêşîyan de. Mîna "Ku te girt bemedê û ku te berda jî bi dût mekev" yan jî "Yê zane zane, yê nizane baqê nîska ye". Zimanê peyvên pêşîyan zelal û bîna ye. Gotin neqandî, helandî û parzîndî ne. Di wan de ji awîra edebî û zimanî de tiştekî mirov bêje ev ne pêwîst e, ha ev zivrayî û zêdeyîyek e û heger tûnebûya tiştek nediqewimî, pêde nabe. Her tişt di cihê xwe de hatiye gotin, li wezin û pîvanên sal û qîran ketiye û wîzeyê xwe ji zemên girtiye. Ji awîra felsefî û civakî ve peyvên bi mantiq û bi felsefeya îro re neguncaw hebin, ji hin peyvên bêhna nerewahiyan çinayeti û cînsî bîna jî, gava ku mirov di pencereya zelalî û bedewiyê re li wan dinêre mirov hinekî din hez ji zimanê xwe dîke û li ser hêza zimanê xwe hinekî din serwest dibe.

Li welat û navçeya Rojhilata Navîn ku em jê tên, dîroka peyvên pêşîyan zehf kevin e. Eser û lewhe dîrokî û berhemên di vê derbarê de ku em dixwînin vê nîşan didin. Berî bi 4 hezar salan peyvên pêşîyan li ser lewheyên cur bi cur hatine nivîsandin û civandin.

Careke dî li gorî ku zanayên dîroka peyvên pêşîyan dibêjin hurmeta firewnên Misrê ji bo peyvên pêşîyan û pend û şîretan gelekî zêde bû. Tê gotin ku şarezayî û jîrekiya firewnêkî li Misrê heta bi dereceyekê li gorî hejmara peyvên pêşîyan ku ji yên piştî xwe re dihiştin, dihatê nîrxandin. Firewnêkî jêhatî û bîrbir gerek jî cîgirê xwe re hejmara gotinên pêşîyan mîna sermaye bihiştana. Ji ber ku hê di serdema firewnan de li Misrê her peyveke pêşîyan mîna rêber û rêpêşanderekê dihatê qebûlîkirin. Welat jî hene ku di zemanê xwe de peyvên pêşîyan di kitêbên dersan de kom kirine û li xwendegêh û zanîngehan jiberkirina wan hatiye xwestin û mîna mecbûriyetekê bûne xwedî pesin.

Li Çînê, qedir û qîmetê peyvên pêşîyan hê diyartir e û peyvên pêşîyan bûne faktoreke fikirkirina felsefî û avabûna sîstemên felsefî. Filozofên vî welatî felsefeyên xwe li ser esasê gotinên pêşîyan ava kirine û peyvên pêşîyan bûne malzeme û zexîreyeke fikrî.

Li gorî baweriyekê, li welatên Skandinavyayê, nivîsandinê bi peyvên pêşîyan dest pê kirîye. Ji serdema Ronasîsê û vir de, li Ewropayê peyvên pêşîyan tene civandin. Heta niha bi sedan kitêbên ku li ser peyvên pêşîyan in û peyvên pêşîyan hembêz dikin çêbûne û mirov dikare di kitêbxaneyên ewrûpî de bibîne.

Zimanê kurdî di aliyê peyvên pêşîyan de dewlemend û tîr û tije ye. Heyf e ku heta niha ji çend kitêbên mîna yên Hüseyin Deniz, Mustafa Bozak pê ve bi taybetî li bakurê Kurdistanê û bi tîpên latînî, bi kurdiya jorî hê kitêbeke ku bersiva vî dewlemendiyê bide, peyvên pêşîyan bîna cem hev, di kitêbxaneyên me de tune ye. Kitêbeke din ku divê em bi nav bikin kitêba Mehmûd Dêrşewî ye. Ev berhevoka peyvên pêşîyan jî, bi devokê behdînanî ye û navê wê "Miştaxa Çîyan" e ku berî bi 6-7 salan li Swêdê çap bûye. Ev hewleke baş e. Di kitêba Mehmûd Dêrşewî de 867 gotinên pêşîyan hene. Bî qasî ku em agahdar in mamoste Amed Tîgrîs jî ev çend sal in li ser kitêbeke peyvên pêşîyan kar dîke. Em hêvîdar in ku zû çap bibe û bigihê destên xwendevanan.



Hunermend Seîd Gabarî hate Stenbolê û seredaniya me jî kir. Ev hunermendê hanê, demekî dirêj bi awayekî çalak di nav Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Iraqê (PDK-I) de xebitiye. Yanê wî, hunermendî û siyaseta ligel hev meşandine. Lê vê gavê tenê bi muzîkê radibe. Hevalê me DILDAR ŞEKO pê re li ser muzîk, jiyana wî ya siyasî û sedemên veqetîna ji PDK'ê hevpeyvînek pêk anî. Ev e pirsên Dildar Şeko û ev e bersivên Seîd Gabarî...

Hunermend Seîd Gabarî:

Rola hunermend ne kêmtirî rola serokekî ye

Di kîjan salê de we dest bi karê hunermendiyê kiriye û di gorepana siyasî de rola hunermendiyê çend e?

● Di sala 1970'yî de min dest bi karê hunermendiyê kir. Bi duristî, di beyana adara ku di navbera hikûmeta Iraqê û kurdan de hate ragihandin de, min dest bi vî karî kiriye. Piştî ku çavên min wisa bûn, êdî di laşê min de valahiyekê dest pê kir.

Di rûdanên bi vî rengî de bivê nevet mirov li alternatîfê digere. Ez jî, di rêka hunerî de jî bo vê valahîya di laşê xwe de li alternatîfê geriyam. Ji bilî vî jî, malbata me jî berê de binamaleke welatperwer e.

Li ser pirsê te ya rola hunermend di kar û xebata siyasî de. Di bawerîya min de rola hunermendekî di kar û xebata siyasî de wekî rola serokekî xurt û bihêz e. Heger ne bi hêztir be, ne kêmtir e jî. Min hurmet û rêz ji serok û rêberan heye, lê ez vê dibînim; yê hunermend gava ku bi duristî ji gelê xwe re bixebitin, ew kasetê wî dikeve hemû malan. Pale û perîşan, cotkar û gundî, dikandar û karmend, xwendevan, bi kurtayî biçûk û mezin her kes guhdariya vê kasetê wî dike. Ew kaset dikare tesîra xwe gelekî bike.

Bo nimûne, cenabê te bi xwe jî wê ji tiştinan re şahid be. Li başûrê Kurdistanê ez pêşmerge bûm. Dema ez diçûme gundekî, li her gundekî ku min semînerê dabûya an min kêlîkekê ji wan re tembûr jênandibûna, gava ez ji gund derdikevim çar pênc gencan didane dîv min û ji min re digotin: "Seyda em hatine bibin pêşmerge".

Di vir de xweş diyar dibe ku rola yê hunermend roleke pir mezin e. Rola yê hunermend pir mezin e lê, îcar ku yê hunermend buhayê huner û wezîfeya xwe zanibe û sincê (exlaqê) hunermendiyê karibe di kesatiya xwe de biparêze û zanibe kengê, li ku wê çî bibêje. Bi

kurtayî, divê hunermend bi xwe şoreşek be. Ez nabêjim bila partiyek be, bila karibe di pêşkeftina şoreşekê de alîkarekî xurt be. Ji ber ku yê hunermend çu berjewendiyê taybet nîn e û berjewendiyê wisa neparêze, çihê bawerîya gel e. Li pêş vê ronahiyê, divê kesê hunermend jî hêjayî bawerîya gel be.

Divê hunermend xwe sivik neke, xwe tamsar neke, stranên kelevajî nebêje, kevnetoreya gelê xwe ya neteweyî ji bo piçek berjewendiyê xwe ya taybet nedize û nebe ji xelkê re û divê welatparêziyê, armanca xwe ya yekane û bingehîn zanibe. Gava ku bi vî rengî kar bike, wê hingê mirov dikare bibêje; rola yê hunermend ne kêmtirî rola serokekî ye û her wisa ew ziman û rêberê gelê xwe ye.

Bethoven dibêje: "Heger hûn bixwazin pêşkeftina mîletan heta kîjan radeyê ye, li muzîk û hunera wî mîletî guhdarî bikin."

Kak Seîd, li gorî gotina we, heger yê serok, serokê mîlet be, yê hunermend jî zimanê mîlet e...

● Birako, min hurmet û rêz ji bo serokan heye, ez ne li dijî serokan û xebata wan im. Dibêjin şivan bêpez nabe, mîlet jî bêserok nabe. Dibe ku serok, serokê partiyekê be. Heta niha kesekî ji wan çu Kurdistan ava nekirine. Lê hunermend malê mîlet bi teyayî ye.

Hûn dikarin rewşa muzîka kurdî ya îroyîn ji bo me destnîşan bikin? Li gorî muzîka der û cîranan, muzîka kurdî di çi astê de ye?

● Heger ev mesele bê vekolandin, wê gelek kes biêşin. Vêja min navê ez hinde kûr dakevim, lê di bawerîya min de rewşa muzîka kurdî îro ketiye wêreki talanê. Navê wê nemaye kultur, kevnetore. Ev nav hemû tevlihev bûne. Ji bilî wan kesên ku pêdiviya şoreşê wan mecbûr dike ku ji bo bisêşerên li serê



çiya stranên xwe dibêjin, hunermendên me bi şeweyekî ne di çihê xwe de dest avêtine huner û kevnetoreya kurdî.

Kî ji xwe re du gotinan ji çihêkî bin wê li hev siwar bikin û wê herin studyokê, bi zîmanekî şikestî, bi kurdîyeke bêserûber, bi kurmançiyê jî hev ketî kasetan dagirin. Êdî xelkê biyan gava van rengekasetan dibînin, nêrîneke negatîf li ser zîman û muzîka kurdî bi wan re peyda dibe.

Ev zîman û kevnetoreya ku bi heza-

mendên çak û balkêş wê hebin. Ez ne ji wan kesan re dibêjim. Gotina min ji wan kesan re ye ku, ji bo navên xwe û berjewendiyên xwe zîman û kevnetoreya kurdî bêserûber dikin. Heger piçek welatparêzî bi wan kesan re hebe, bila bîn em milên xwe bidin hev û bi rengekî hevçerx (hemdem) em berheman bidin.

Ev çend roj in ku ez hatime Stenbolê û ji bo min delfîve hilkeft ku ez guhdariya hinekan ji wan kesên ku ez dibê-



Li başûrê Kurdistanê serekanî ji ber ku ne zelal bû, ew ked û xebata salan hemû beyhûde çû. Lê li Bakur ne wisa ye. Pêngavên ku diavêjin bi rastî jî çihê şanazî û pesndanê ne. Daxwaza min ji bizava Bakur ew e ku, rê nede rêxistinên dîtir yê kurdî ku, ew bikevin hembêza dijîmanan.

ran sal bi serbilindî hatiye heta roja îro, bi destên hunermendên wisa bêxem bikeve vî warî, bi rastî çihê daxê ye. Ez bi xwe bi vê yekê gelekî diêşim.

Belê, gelek hunermendên balkêş jî hene mamoste...

● Vêca mîlet dehl e, şêr jî hene, ro-vî jî hene birakê min. Helbet huner-

jî, bikim. Qaşo bi kurdî strane, lê bi Xwedê zîmanê ku pê digotin xweş tirkî bû.

Hûn dê karibin nêrîna xwe ya li ser jarî û dewlemendiya folklor û kelepora kurdî ji bo me pêşkêş bikin?

● Folklor û kevnetoreya kurdî, te dî, mirov xwe bi derdora xwe re, bi cîranê

xwe re qiyas dike. Ez li welatê xwe jî û li welatên derdora xwe jî gelek geriyame û her wisa digel welatên Rojava ez li 83 dewletan geriyame. Ji ber ku tekarê min huner û folklor e, ji nêzik de min agah ji folklor û hunermendiya van welatan heye.

Ne ku ez bi hestekî neteweyî dipeyivim an jî ez kurd im, wekî berevaniyekê ji folklorê kurdî dikim. Lê bi şeref, bêxwarî ez ji nîva kezeba xwe dibêjim, tu kevnore bi kûrahiya reha xwe û bi berfirehbûna xwe nagihe ya gelê kurd. Ez çûme nav farisan, ma ne faris jî qewmekî kevn e. Heger ji me ne kevn-tir be, ji me ne nûtir e. Ez li nav farisan gelekî geriyame û ez bi farisî jî xweş dizanim. Lê hûn bawer bikin kevnoreya farisan jî wekî ya kurdan nabe.

Bibore mamoste, her wekî tê zanîn ku îro faris jî bi edebiyat û mûzîka xwe ya bengîn û xurt, navdartinîrîn millet e di Rojhilata Navîn de...

● Belê, xwedî edebiyat û muzîkeyeke zor pêşkeftî ne, ji berê de xwedî dewlet in, xwedî televîzyon û radyo ne, xwediyê gelek amûrên mûzîkî yên resen in jî, lê di ser van tiştan hemûyan re û digel derbederî, perîşanî û hebûna zilm û zordariyê dijwar li ser gelê kurd ku bi tu awayî nayê saloxdan, dîsa jî folklor û kevnoreya gelê kurd a resen ji ya farisan û ji ya wan dewletên ku ez bi xwe li ser kevnoreya wan bi hûrbîrî rawestiya me, bi gelekî xweştir û dewlemantir e.

Min delil pê heye! Werde Cezaîriye, stranbêjeke ereban a navdar e. Awazjênê wan î mezin Belîx Hemdî 26 awazên kurdî dizîne û dane vê stranbêja navbirî.

Delîleke din. Li Tirkiyeyê, ji Mahsun Kırmızıgül bigire heta bi İbo re çarkeve û heta bigehê Arif Sağ û yên mayî, yek ji wan nemaye ku ji kevnoreya kurdî nedizîne.

Delîleke din ji Îranê. Ji Şeceryan, Belûryan, Axasî bigire heta bi hunermendên azerî, wan jî ji lorî, ji kelhorî, ji hewremanî, ji soranî û ji şikakî, têra xwe dizîne. Ez bi xwe jî bi piraniya van dengbêjên navbirî re peyivî me û min ev pirs ji wan kiriye. "Çima hûn wisa dikin?" Lê mixabin ku bersiva wan dûtî bersiveke hunermendî bû.

Mamostecan, gelek caran di radyoyên tirkî û erebî de em li navên hinek awazan rast tên. Wekî nihawend kurdî, hîcazkar kurdî, semah kurdî. Wisa diyar e ku peywendiyên kurdan bi van awazan re hene. Gelo tu tîkiliya van awazan bi mûzîka kurdî re heye û heger tîkilî hebe, çend awazên kurdî yên bi vî rengî hene?

● Gelek in birakto...

Hejmara wan çend in, hûn dê kari-bin ji me re destnîşan bikin?

● Divêt ez yek bi yek wan ji te re bihejmêrim. Ji bo vê yekê jî a niha ez ne berhev im. Ji bilî evên ku te hejmartin, kurdo, heyranok, payîzok, lawij, şilavî hene. Awazên di ber destar re cuda ne

ji yên dankutanê. Awazên palehiyê, yên kolana rez û werzan, yên quraftina tîrî, yên gava ku keçik diçin kerengan an qirşikan û her wisa, bi awaz û ristinên xwe ve hemû ji hev cuda ne. Li vir, ez dixwazim bi straneke gava ku keçik



Bi kurtayî, kevnoreya kurdî kevnoreyêke zêrîn e û digel rêzgirtina min ji huner û hunermend û kevnoreyên welatên cîran re, ez dikarim bi hunermendên wan re rûnim û vê pirsê ji wan bikim, bê ka wan çend awazên kurdî dizîne? Lê ew nikarin vê pirsê ji me bikin.

diçin bêriyê, ango bi straneke bêrvaniyê dewlemendiya folklorê kurdî bidim xuyakirin.

*Bihar e van şivana pezi bêr e bêr e
Serbêr bi heliz e û binbêr bi kinêr e
Dostika min rûniştîye li serî bêr e
Bi desta pez doşaye bi çavan çavnihere
Bi lingan ku digire, bi hûçikan pez vegere
Bi burhan îşareta dike dibêje
Lo şivano tu dêhnekê, bîstekê were êre
Sing û ber û bedena min rindê rîhanê
Mîna kanîkorkên zozanên Serhedê
Dema ava ser fersikan jê ve têtin pêl bi pêl e
Mîrov qurtekê ji wê avê bide kalekî heştê salî
Ku bi gopal, bi rê ve diçe
Mîrov hevî dike ka çêtir e ji doh û pêr e
Vedigere jiyê çardesaliyê gelekî ber bi xêr e...*

Ev pesîndariyên hanê, béguman bi hebûna zimanekî dewlemend ve girê-

dayî ne. Ev wesf û pesndana hanê yên wan kesên ku di jiyana xwe de nizanin xwendin çî ye. Li hemberî vê yekê gava ku em li helbestvan û hunermendên farisan dinêrin, em dibînin ku hemû xwendevan in û xwendina xwe ya bi-

lind kirine. Lê gava ku em li yekî wek Hesen Zîrek binêrin, vî hunermendê kurd, di hemû jiyana xwe de rojekê ji nexwendiyê. Digel wisa jî, bi sedan kasetên wî yên gelekî heja hene. Vêja divêt ku ne bes hunermendên kurdan, xwendevan û rewşenbîrên kurdan jî baş agahî ji vê dewlemendiyê hebin û di hemû karên xwe de bi xwe bawer bin.

Dibêjin ku meqamên Rojhilat çil û pênc in. Lê bawer bike, ez dikarim yên kurdî bi ser hefsed meqaman bixim. Ne ku ez dikarim, ne ku hunera min e. Malên gel in.

Bo nimûne straneke İbo heye ku ji wê stranê re 'Ayağında kundura' tê gotin û ev stran di meqamê muhayer kurdî de ye. Her bi vî meqamî, bi sedansal e ku bi kurmançî jî û bi soranî jî, stranek tê gotin. Ew jî strana 'Nazliyê' ye. (Di vir de S. Gabarî, bi awaz û bi her du



Seîd Gabarî wek kurdekî ji binemaleke kurdî destkurt û perîşan, di sala 1956'an de li gundekî derdorê Qamişloka rengîn hatiye dinyayê. Di jiyê (temenê) xwe yî 12 salî de jî, nexweşiya wî dest pê kiriye û ji çavên xwe bûye. Egerên ku çavên wî wisa bûne hene. Ew li ser vê mijarê wiha dibêje: "Ez hevîdar im ku hûnê li min biborin. Çimkî ger ez vê meseleyê vekolim wê li ser hinekên din bibê bargiranî. Vêja min nevêt ev mesele bê vekolandin. Bi kurtayî mese-la çavên min ne ji zikmakî de ye."

zaravan vê stranê dibêje.) Vêja di fikra İbo de ku kurd hinde xêşim in û wê nizanibin ku İbo û yên wekî wî ev awaz û bi sedan awazên dîtir ji wan dizîne.

Bi kurtayî, kevnoreya kurdî kevnoreyêke zêrîn e û digel rêzgirtina min ji huner û hunermend û kevnoreya welatên cîran re, ez dikarim bi hunermendên wan re rûnim û vê pirsê ji wan bikim, bê ka wan çend awazên kurdî dizîne? Lê ew nikarin vê pirsê ji me bikin. Ji ber ku kurd xwedanê kevnoreyêke zor dewlemend in, me pêwistî bi dizîya awaz û kevnoreya kesekî nîn e. Jixwe sinc û rewîsta zimanê kurdî jî vî tiştî di nav xwe de qebûl nake û gava ku ew jî vî karî dikin, ew awaz bi xwe, xwe dide dest ku ne li gorî fonetîk û awazên wan ên resen in.

Her wekî em dizanin hûn tenha bi saz û awazan û li derveyî welat neman. Di sala 1982'an hûn derbasî çiyê bûne û di gorepana şoreşa gulanê de we cihê xwe girt. Piştî çar, pênc şalan me zanî ku hûn bi dilekî şikestî ji vê gorepanê derketine. Tiştên ku hûn ber bi şoreşa gulanê ve birin û egerên ku we jê dane revandin çî bûn gelo?

● (Piştî kêşana axîneke dirêj) Ma ez ji te re çî bibêjim, birînen min gelekî kûr in. Ez ji ku dest pê bikim nizanim.

Ez genc bûm. Xwîna min germ bû û hestê neteweyî bi min re bilind bû. Demêke dirêj li Sûriyeyê min stranên siyasî gotin. Ji ber vê yekê ez di çavê dewletê de tawanbar (sûcdar) bûm. Dema ku şoreşa gulanê (1977) dest pê kir, ji bo min delîveyêke (keyseke) zêrîn hilkeft. Her di dawiya vê salê de ez derbasî başûrê Kurdistanê bûm.

Piştî tevgereke hunerî digel hunermendên heja wekî Şemal Saîb, Tahir Tewfîq, Elî Merdan, Fuad Ahmed, Tehsîn Taha û gelekên dî, di sala 1982'yan de ez çûme serî (çiyê), nav pêşmergan. Ji wir jî em derbasî Îranê bûn. Çîroka min dirêj e, bi duristî tu dixwazî ez bersiva çî bidim?

Temet ku em dizanin di payiza 1982'yan de hûn bi dilekî germ beşdarî nav rêzên şoreşê, ango, hûn beşdarî nav rêzên PDK'ê bûn. Heta bi dawiya sala 1986'an hûn di nav wan de man û paşê hûn bi dilekî şikestî veqeriyên Iraqê û ji wir jî derbasî Sûriyeyê bûn. Daxwaza min daxuyakirina egerên dîl-sariya we ya ji "Şoreşa Gulanê" ye.

● Ji ber ku ez ji jiyana xwe bêzar bûm. Ez çûm ku em bi hev re ava bikin. Lê mixabin min dît ku ez jî, bêhemdî xwe dibim şirikê xerabiyê. Yanê, em çiqas bibêjin nebêjin, ew (PDK) dev ji şerê birakujiyê bernadin. Dijminê me bi kêfa xwe dawetê dike û ê van jî geh berê tivinga wan di sînga Samî de bû, geh bera celaliya didan û geh jî dibûn pastarên îranê, êrişî ser pêşmergeyên rojhilatê Kurdistanê dikirin.

Dûmahîk Rûpel 15

'Li Iraqê jiyana çandî ziwa ye'

Mihemed Mezlûm yek ji helbestvanên ereb ên Iraqê ye, navekî girîng e di nav civata helbestvanên nûjen de, a niha wekî rojnamegerêkî iraqî li derveyî welêt dixebite û li Şamê bi cih bûye.

M. Mezlûm di sala 1963'yan de li Iraqê hatiye dinyayê, pirtûkên wî ev in:

1) Kirinên nenivîsandî, helbest, Beyrût, 1992, 2) Yê dereng hat, helbest, Beyrût, 1994, 3) Mihemed û yên pê re, helbest, Beyrût, 1996.

Ev hevpeyvîna jêrîn li Şamê pê re saz bû.

Tu xwe dixî çî rêzê di helbesta erebî de li Iraqê û tu rewşa helbesta iraqî ya îroyîn çawa dibînî?

– Li Iraqê jiyana çandî jiyanekê ziwa ye, hişkayî di têkiliyên rewşenbîran de û di nêrînên wan de berbiçav e. Ji ber vê tu dibînî di helbesta iraqî de ji nîfşê pêşî ve û hetanî niha di jiyayî berdeyam e, her wiha jî di nav rêzên helbestvanan de. Tu helbestvan nikare li cem me bi tena xwe, xwe pêşkêş bike.

Helbestvan xwe bêhtir di hundirê grûb û komikan de dibîne, nîfşê bûbû alternatîf, nîfşê pêşî heye, pişt re yên salên pêncî, şeşî, heftîyî, heştîyî û notî. Ez bi xwe di hundirê van deh salan de (1980–90) derketim holê, nav li me bû "nîfşê cengê".

Lê li ser helbesta iraqî bi gelemperî tu nikarî nêrîneke zelal bidî. Çimkî dîmen parçe parçe ye, helbesta di hundirê Iraqê de û ya sirgûniyê ne wekî hev e. Helbestin hene bi pesnê rêjîmê mijûl dibin û hinek jî berxwedan ji wan re bingeh e, lê ez bawer dikim ku helbesta iraqî ya ku bingeh danî ji helbesta erebî bi tevayî re, dikare tim û tim vê helbestê zengîn û bilind bike.

Hetanî niha rexnevan bi nîfşê pêşî mijûl in, belkî ev sedem e ku di rexneyên îroyîn de nûbûn tune ye. Pirs ev e, tu tevgerên rexneyî bi nivîsarên we re derketine holê?

– Sedemên ku rexnevan hiştine di hundirê xelesa nîfşê pêşî de, di baweriyaya min de ev in: Nivîsarên vî nîfşî xuyanî ne û bi temamî li ber çav in. Ango, berhemên wan amade û hazir in li ber destan. Her wiha rexne bi xwe li cem me paşverû ye û pirî caran rexnevanan li dijî nûjenî û li dijî serêşa ku berhemên nû bi xwe re tine ne.

Nûjeniya erebî, di nêrîna min de, hîn di gava xwe ya yekemîn de dijî, ya ku nîfşê pêşî pê rabû û hemû berhemên bi dû de û heta niha daxwazê ji bo avêtina gava duyemîn, hîn em di xelesa pirsên nûjeniya yekemîn de ne. Ji ber vê yekê lêkolîn fireh dibe û mezîna dibe û helbesta erebî hîn alî û cihekî xuyanî ji xwe re neditiye.

Nîfşê me jî ne dîr e ji vê rewşê, berhemên me hîn rexne li wan rast nehatiye û rexne xwe naêşîne ji bo ku li helbestê bigere. Û rexne, li ba min, nivîsandinek din e ji nivîsarê re û hîn em li derveyî rexneya rast in. Tiştê ku li ser berhemên min belav bûn, gotarokên rojnameyan û nêrînên bi lez bûn.



Helbestvanê rast sirgûniya xwe bi xwe re hildigire li her cih û warî, ez bi xwe sirgûn bûm li welatê xwe. Sirgûnî di min de dijî, ev sirgûnî jî bêhtir sirgûniyê xurt dike, nivîsandin jî bi xwe deng û bêhna vê sirgûniyê ye, ew jî sirgûn e. Çimkî tim dev ji xwe berdide û dikeve awayekî din.

Torevanekî arjentînî Xolyo Kortazar dibêje: "Bila ez torevanekî ne baş bim li welatê xwe, lê ez ne torevanekî baş bim li sirgûnê." Helbestvanê li sirgûnê M. Mezlûm vê peyvê çawa dibîne?

– Çima em peyva wî wisa nabêjin: "Ez dixwazim ez torevanekî baş bim li welatê xwe." – Di nêrîna min de, toreya hêja hêja ye, çî li welat be û çî li derveyî welêt be. Lê mixabin sirgûn bû "îdeolojî", li sirgûnan "torevan" û "nivîskar" in dizên ku tiştêkî wan bi nivîsandinê ve tune ye, lê ji sirgûniya xwe îstifade dikin û riya torevaniyê vekirî dibînin. Dibe ku ev sedema peyva Kortazar be.

Helbestvanê rast sirgûniya xwe bi xwe re hildigire li her cih û warî, ez bi xwe sirgûn bûm li welatê xwe, belkî ev hest bi min re çêbû, piştî ku min dev ji welatê xwe yî yekemîn berda (mala zarokatiya diya min). Sirgûnî di min de dijî ev sirgûniya jî bêhtir sirgûniyê xurt dike, nivîsandin jî bi xwe deng û bêhna vê sirgûniyê ye, ew jî sirgûn e. Çimkî tim dev ji xwe berdide û dikeve awayekî din.

Ligel ku tu dewlet bi navê Kurdistan

rasiyê de. Ew bûbû nimûneyekî balkêş li herêmê.

Naxwe pêwîst e tu hinekî rawestî li ser têkiliyên di navbera çanda erebî û kurdî de, çimkî tu yekî herî nêzik î ji vê babetê?

– Dîroka çanda kurdî ji ya erebî nayê cudakirin, ev nakeve wê maneyê ku ne du çand in. Ango her çandek taybetiyek û rewşek cuda jê re heye jî, ez naxwazim bi firehî li ser vê pîrsgirêkê rawestim, ev hewceyî lêkolîneke taybetî ye. Lê ez dixwazim bibêjim ku di hundirê çanda kurdî de du şax hene. A yekemîn a ku bi zimanê kurdî tê nivîsandin, ev tore fireh e lê "bi tenê" ye çimkî kêr jê tete wergerandin, lê min hinek ji berhemên girîng nas kirin mîna Şerko Bêkes û Refîq Sabir û xwediyê helbesta surealizmî di helbesta kurdî ya hemdem de "Ebbas Abdulla Yûsiv".

Şaxê din, helbesta kurdî ku bi erebî dinivîsandin û gelekî baş xuyaniya rola helbestvanên kurd di pêşxistina helbesta erebî de heye.

Bêyî ku em navên bi deng bibêjin em dikarin hinek navên nû di helbestê de bibêjin. Li Iraqê, Celal Zengabadî, Letîf Helmet, Selah Şewan. Li Sûriyê, Luqman Mehmûd, Rifet Şexo, Taha Xelîl Ibarîm Elyûsîf, Luqman Dêrkî ... Ji bilî vê gelek hevalên min ên nêzik li Kurdistanê Iraqê hene, wekî Mehmûd Zamdar û Şêrzad Hesen û Ebbas Abdulla Yûsiv.

Hobs dibêje "Mîrov gurê mirov e" û Corc Simmon dibêje "Mîrov lawirê bi tenê ye ku bi hewceyî parastinê ye" û mirovê kurd tim di bin perdeya mirinê de ye û tim jî xeleekek tê danîn li hawirdora çargoşeya kurdî, helbestvan M. Mezlûm çî dibêje li ser mirovê kurd?

– Ji destpêka dîrokê ve, vê cudatiyê dest pê kiriye, kuştî û mêrkuj, kole û koleddar. Çerxa demê hişk û berevajî digere, hişk mirovê kurd bi tirsê hatiye dagirtin û ketiye rengê qurbanê, lê carinan kesên kurd bi vê rewşê tê girêdan bi rengekî Mazoxî. Hema li rewşa Kurdistanê Iraqê binêre, li kêleka tiştên xweş ên ku me anîn zimên, birakujî jî heye. Bi sedan kurdên bêguneh bûn qurban. Çimkî dîroka mîletê kurd bi zor û xwînê hatiye nivîsandin. Mebesta min ev e ku dîroka vê qurbanê di hundirê wê de bûye dubend, ji ber vê yekê dibe ku peyva Hobs nêzikî rasiyê be, di baweriyaya min de van bûyeran gelek bandor di toreya kurdî kiriyê û ew bi awayekî îdeolojîk berçav kiriyê.

Tu dikarî bibêji îdeolojiya bobelatan di nivîsaran de xuya kir. Nivîsarên ku bûyerê tînin zimên lê nikarin bigihînin asteke bilind. Wekî mînak, min gelek nivîsandin xwendin li ser bobelata Helebçeyê, lê kêr jî wan bi kêr dihatin. Û hindik jî wan dest çatanîn ser dilê mirovayetiye. Mirovê kurd divê ji xelesa kolektî û qurbanîyê derkeve û nebe celadê xwe.

HEVPEYVÎN: HELÎM YÛSIV Û LUQMAN MEHMÛD



Li Navendên çandê çalakiyên vê hefteyê
Li Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) şaxa Stenbolê
● 22.12.96/Yekşem: Çîrokên me; Dayika Perîxan û Apê Huseyn,
saet:14.00
Teatra Jiyana Nû; Daweya Generalê Teneke, saet:18.00
● 25.12.96/Çarşem: Panel a bi navê Tevgerên Ciwanan û
Terorîzm, Zek Öcal, Orhan Gökdemir, saet:18.00
● 27.12.96/În: Filmê Dîwar (Duvar), saet:18.00
● 28.12.96/Şemf: Konsera Ferhat Tunç, saet:14.30
"Ji xwarinên kurdî çend nimûne" (Kürt mutfagından yemekler),

saet:16.00
Film: Bisikletçi, saet:17.30
Li NÇM'ya İzmirê
● 22.12.96/Yekşem: Konsera Koma Amed, saet:17.30
Li Evrensel Kültür Merkezi (EKM)
● 22.12.96/Şemf: Dîroka Tekoşîna Karkeran li Tirkiyeyê (3)
Li Tirkiyeyê Çanda Çîna Karkeran; Aydın Çubukçu, Sunay Akın,
saet:15.00
● 22.12.96/Duşem: Film: Rê (Yol) Yılmaz Güney, saet:19.30
● 27.12.96/În: Konsera Fevzi Kurtuluş, saet:19.00

RÛDAN

Kongreya Entîtuya Kurdî



Roja 15'ê berfanbarê li "Tarık Zafer Tunaya Kültür Merkezi"yê Kongreya 4'an a Enstituya Kurdî pêk hat. Zêdetirî 50 kesên ku bi piranî endamên enstîtyûyê bûn, beşdarî kongreyê bûn. Kongreyê bi axatîna destpêk û rêz-girtinê dest pê kir. Piştî hilbijartina dîwanê, rapora çalakiyan hate xwendin. Di raporê de çalakiyên ku Enstituya Kurdî pêk anîne, dihatin vegotin. Ji nava van çalakiyan a herî balkêş "Sempozyuma Gelşa Kurd û Çareseriya Demokratîk" bû. Ji bo diwarojê jî, di raporê de hin pêşniyazên girîng hebûn, wekî amadekirina arşîveke dewlemend, derxistina ferhengeke dorfireh ku tê de peyvên her sê zaravayên kurdî hene û li Stenbolê lidarxistina Konferansa Rênûs û Rêzimana Kurdî.

Li dû xwendina raporê, dîtî û rexneyên li ser raporê hatin pêşkêşkirin, di nav van axaftinan de rexneyên Kaya Müştakhan ên ku li dîwanê girtin û gotinên Mele Abdullah Varlı hejaya dabaxkirinê bûn. Piştî rexneyên Müştakhan, Serokê dîwanê Tarık Ziya Ekinci dev ji axaftina bi tirkî berda. Mele Varlı jî di axaftina xwe de da zanîn ku îradeyekê ev mirov li hev civandine, divê em spasiyên xwe jî ve îradeyê re pêşkêş bikin, di sa gotinên wî yê li ser kurdîna sasanî û safewiyana heja û balkêş bûn.

Piştî van axaftinan, Serokê Enstîtyûyê

yê berê Şefik Beyaz derket ser kursiyê û diyar kir ku wî dixwest rexneyên tûjtir werin, lê di nav van rexneyan de pêşniyazên ji bo dema bê jî hebûn.

Li pey axaftina Şefik Beyaz, li ser hilbijartina kargerî û komîteyan gotûbêj çêbûn. Di encama van guftûgoyan de biryar hate dayîn ku kargerî jî 13 kesan pêk were û digel listeya ku Şefik Beyaz pêşkêş kiriye, kesên ku dixwazin, serbixwe têkevin hilbijartinê. Li dû ve biryarê hilbijartinê çêbû, di hilbijartinê de 37 endamên Enstîtyua Kurdî dengê xwe dan û 13 kesên ku di listeya Şefik Beyaz de cih girtibûn hatin hilbijartin. Sê kesên ku serbixwe ketin hilbijartinê jî bûn berendamê Komîteya Karger. Kesên ku ketin Komîteya Karger ev bûn: M. Şafî Ekinci, İsmet Kılıçaslan, Çetin Özel, Sami Tan, Şefik Beyaz, Raif Yaman, Hasan Kaya, Emin Köse, Edibe Şahin, M. Reşid İrgat, F. Hüseyin Sağnıç, Kerem Soylu, Mevlüt Çetinkaya. Navê sê kesên berendam jî ev bû: Faik Yağızay, Fevzi Bilge, Murat Batgi. Ji bilî ve Kaya Müştakhan û Faik Bulut jî komîteya zanyarî yekîşîn, Medeni Ayhan kete nava komîteyê.

Kongre bi diyarkirina encama hilbijartinê qediya, serokê enstîtyûyê yê nû wê jî aliyê Komîteya Karger ve, were hilbijartin.

BERZAN MIRDÊSÎ

TÎŞK

ŞÜKRÜ GÜLMÜŞ



Partiya, me azadiya me

Wextekî Sîropê ermenî stranek digot:
Ji partiya xwe em gelek razî ne
Xeberê partiyê ji me re mizgîn e
Xêr û xweşiyê wê ji me re bîne
Mirovê sovyetê hemû bira ne
Lenîne mezin tim li bîra wan e

Em ji partiya xwe qet nakin gazin
Edalek lê ye, edalek mezin
Çiqas qîz û xort usa î mezin...

Gava di despêka şoreşgeriya xwe de me li Sîrop guhdarî dikir, em ji îşqê difiriyan. Me, ew stran digot li gorî xwe. Me li şûna Sovyetê, Kurdistan danî, li şûna Lenîn jî me carekê navê Haki digot. Ew strana me ya ji Lenîn re, ji gelên Sovyetên re hîna jî heye. Ez bi gelan û bi sosyalîzmê bawer im.

Di 27'ê sermawezê de, partiya me kete 18 saliya xwe. Ew emrê teze, ew azadiya me, li me hemûyan pîroz be. Ji bo ku pîrozbahî zêde bibe, divê em pêngavine din jî biavêjin. Her mirovê kurd, welatparêz, demokrat divê xwe nû bike. Sersala partiyê, wê wiha mezin bibe. Partî kî ye? Çi kes e? Çawa ye? Bersiv yek e; partî gel e. Partî jî bo gel heye. Heta gel ranebe, azadî jî nayê.

Partî jî wekî jiyana însanan e; ew jî çêdibe, dijî, emirdarî dibe û dimire. Mirina partiyan gava ku ji gel re nebe ye. Partiya ku ne bî gelê xwe re be ew partî êdî gere bimire, ku nemire jî divê gel wê bikuje. Li welatên ku azadî û serxwebûna xwe girtine û li partiyên wan binêrin. Cara yekem dibêjin "em ji bo gel hene." Lê belê, taliyê dibin bela serê gel.

Îro, partî girîngiyeke mezin e. Ji bo azadiyê, ji bo serxwebûnê û ji bo dewletbûnê ye. Partî ferziyetek e!. Heta em nebin dewlet, ne azad dibin, ne jî serxwebûnê dibînin. Lê gava ku me azadî bi destê xwe xist, wê çaxê emê partiyê jî bidin gorandin. Hekîmê mezin, notirvanê sazûmanê wê gel be.

Li der û dora xwe binêrin. Ereb îro xwediyê nêzikî 24 dewletan in. Li Afrîkayê xwedî eşîret jî bi dewlet in, bi al in; li cihanê tînan naskirin. Li Ewrûpayê welatin hene, bi qanda bajarê Amedê jî tune ne, lê ew jî dewlet in. Kurd jî 30 milyonî pirtir in. Welatê wan bîna (mîna) cihanekê ye. Lê belê, li tu cihî, di resmîyetê de nayên naskirin.

Êdî kes kum nade serê xwe. Ji bo wê yekê ez nabêjim "bila her kes kumê xwe deyne ber xwe!.. Bila bifikire!.." Lê dilê her kesî heye, ez karim bi bêjim bila her kes kulma xwe li ser dilê xwe bixe!. Xwinê bike çalakiyê!.. Heydên hevalino, em bi dil bifikirin. Bênan dibe, bêdil nabe.

Xwezî ne bi şêrê ku du rovî herinê

Şêr hat cihê xwe çiqasî ma, rovî nehat. Şêr êdî baş fem kir ku rovî ew bi zanatî şandiye aliyê şivan û kûçikan. Şêr birîna xwe derman kir. Soz da xwe û got ku ewhe rovî bigire, bibirêjim û wî bixwe.

Belê şêr ji tirsaya paşayê daristanê jî nediwêriya here bi nava daristanê de.

Apê Hesen li malê rûniştî, lawê wî hat û gotê: "Yabo, çima gotine 'xwezî ne bi wî şêrê ku du rovî herinê?'"

Apê Hesen got: "Rûne ez ji te re bibêjim." Lawê wî rûnişt. Apo dom kir û got:

— Rovî birçî bû, ji nava dehlê derket, rastî şêr hat. Xwe li girî danî û got: "Paşayê dehlê hat û gelek gur, şêr, piling kuştin û gotiye ku ji îro pê ve, daristan li şêran, guran û pilingan qedexe ye. Ez hatim ji te re bibêjim ku tu nerî daristanê.

Şêr got: "Te qenciyeke baş bi min kir. De were em bibin hevalê û birakê hev.

Destê biratiyê dan hev û du, jiyana xwe bi hev re derbas kirin. Rojekê keriyekî pez dîtin û qerarek dan ku herin ji xwe re pezekî bînin û bixwin.

Rovî got: "Bira, tu li vir bisekine. Ezê pêşî herim binêrim bê kanî pez bi kîjan alî ve dihere. Şivan û kûçik li kîjan alî ne. Ku ez hatim îcar emê her du herin. Ezê herim aliyê şivan û kûçikan, wê şivan û kûçik bi pey min kevin, tu jî ji aliyê din ve gîskekî duduwan bîne da ku em wan bixwin.

Rovî çû û hat. Şêr şand aliyê şivanan û ew çû aliyê din. Wexta ku şivan û kûçikan şêr dîtin, şivanan bi tivingên xwe digel kûçikan bi dûv şêr ketin, da ku wî bikujin.

Şivanekî tiving berda şêr, şêr birîndar kir. Belê şêr ji mirinê filitî. Rovî jî aliyê din ve pezek ji keriyê qetand bir û çû. Şêr hat cihê xwe çiqasî ma, rovî nehat.

Şêr êdî baş fem kir ku rovî ew bi zanatî şandiye aliyê şivan û kûçikan. Şêr birîna xwe derman kir. Soz da xwe û got ku ewhe rovî bigire, bibirêjim û wî bixwe.

Belê ji tirsaya paşayê daristanê jî nediwêriya here bi nava daristanê de. Birîna şêr pak (xweş) bû, çend rojan çû qiraxê daristanê ku rovî



Rovî derî bi ser de wîsa asê kir ku nikaribe derê. Roviye din jî hat. Her du roviyan agir di devê qula şêr de pêxistin û şêr bi dûxanê di hindur de fetisandin. Apê Hesen piştî çiroka şêr û her du roviyan xelas kir, ji lawê xwe re got: "Ji ber vê serpêhatiyê dibêjin 'xwezî ne bi wî şêrê ku du rovî herinê.'"

bigire. Çendakî şûn de şêr rovî girî. Rovî da pêşiya xwe û got:

"Min soz û ehd daye xwe ku ez te bibirêjim û ez te bixwim. Hindik mabû ku şivan min bikujin. Di rûyê te de ez birîndar bûm."

Şêr, rovî bir nêzikî qula xwe. Şêr peyva xwe dewam kir û got:

"Rovî, revê ji aqilê xwe biavêje. Tu bifirî asîmanan jî tu ji destê min xelas nabî. Îcar here ji derdorê hinek êzing û qirşikan berhev bike, ji bo ku ez goştê te li ser bibirêjim, da ku ez bi kêf te bixwim."

Şêr li devê qula xwe lot da û li rovî temaşe kir. Rovî baş fikirî ku bi rastî rev xêr nake, bi mitale dar û qirşik berhev kirin, carekê dît ku roviyekî din di binê teht de xwe dirêj kiriye.

Roviye binê tehtê pirsî:

"Bira çima tu bi mitale yî?"

Rovî serpêhatiya xwe jê re got. Roviye binê teht got:

"Madem ku şêr ji paşayê daristanê ditirse, ez paşayê daristanê me. Tu hijik mijikan berhev bike û her agir pêxin, ezê gazî te bikim û ezê wisa bibêjim: 'Ez pir birçî bûme, te tu şêr, piling, gur li van dera nedîtine ku ez bixwim?' Tu jî li şêr binêre û bêje: 'Na min kes nedîtine.'"

Wexta şêr "ev kî ye?" bipirse tu bêje: 'Paşayê daristanê ye.' Wê çaxê wê şêr bikeve qula xwe, tu jî derî lê bigire heta ku ez tîm ba we."

Rovî got: "Baş e."

Êzing kom kirin û çû ba şêr, agir pêxistin. Roviye binê teht bi dengê heybet bang kir. Got:

"Xwediyê agir, te şêr, piling, gur kesik nedîtine ku ez wan bixwim?"

Piştî ku ev tişt gotin, rovî li wan temaşe kir. Roviye li ba şêr got:

"Na min tu kes ji wan nedîtine."

Şêr pirsî: "Ev kî ye?"

Rovî got: "Ev paşayê daristanê ye. Zû bikeve qula xwe, heta ku derbas bibe. Ku te li vir bibîne, ez jî çûm."

Şêr bi lez û bez ket qula xwe û got: "Derî baş bi ser min de bigire."

Rovî derî bi ser de wîsa asê kir ku nikaribe derê. Roviye din jî hat. Her du roviyan agir di devê qula şêr de pêxistin û şêr bi dûxanê di hindur de fetisandin.

Apê Hesen piştî çiroka şêr û her du roviyan xelas kir, ji lawê xwe re got:

— Ji ber vê serpêhatiyê dibêjin "xwezî ne bi wî şêrê ku du rovî herinê."

BEREHVKAR: ABBAS ALKAN

Li biyanistanê

Dengê kurdan

Tevgera Azadiyê di warê agahdarkirina raya giştî a cîhanê de gavên berbiçav avêtine, niha li seranserî cîhanê weşanên bi zimanên cur bi cur derdikevin û doza gelê kurd radigihînin gelên cîhanê. Bi vê mebestê li îngilistanê kovarek derdikeve. Kurdistan Report

Tevgera heke dixwaze gelê xwe rizgar bike, divê bi hişyarkirina gelê xwe tenê nemîne, dinyayê jî bi doza gelê xwe bihesîne. Dema mijar kêşayê kurdî be ku jixwe kêşeyeke navneteweyî, ev yek pêwistir dibe.

Tevgera Azadiyê di vî warî de gavên berbiçav avêtine, niha li seranserî cîhanê weşanên bi zimanên cur bi cur derdikevin û doza gelê kurd radigihînin gelên cîhanê. Her wiha televîzyona kurd MED-TV jî digel sê zaravayên kurdî yên sereke (kurmancî, kirdkî, soranî), tirkî, erebî, asûrî û îngilîzî jî weşanê dike.

Bi mebesta agahdarkirina gelên cîhanê li îngilistanê kovarek derdikeve. Navê vê kovarê "Kurdistan Report" e li bin navê kovarê "Ji bo Kurdistanê Azad û Serbixwe" hatiye nivîsîn. Hejmara 24'an a vê kovarê kete destê me, bi rastî jî aliyê dîtbarî û naverokê ve hêjayî pesnê ye. Li ser berga pêşîn sernavê nivîseke Dr. Haluk Gerger cih digire "Kurd wê li Rojhilata Navîn serdemêke nû bidin destpêkirin." Dr. Ger-

ger di vê nivîsa xwe de li ser politikaya şer a dewleta tirk û têkoşîna gelê kurd radiweste. Dr. Gerger dide zanîn ku tu politikayeke dewleta tirk a kurdî nîn e, lewre jî ji bilî şidetê tu çareyê nabîne. Dr. Haluk Gerger bi bîr dixê ku her şer pêwist e bi hin gavên siyasî biqede, lê ji ber ku dewleta tirk li dijî hemû gavên siyasî ye, ew şerekî bêmebest dike.

Ji bilî vê nivîsê hevpeyvîneke digel Cemil Bayik di vê hejmara kovarê de cih digire. Ev hevpeyvîn jî aliyê Sheri Laizer ve hatiye kirin. Cemil Bayik di vê hevpeyvînê de politikayên dewleta tirk û rewşa herêma bi tesbîten balkêş li ber çavan radixe.

Her wiha em jî vê hevpeyvînê hîn dibin ku kontrayên tirk li dijî Cemil Bayik jî xwestinc sûiqastê pêk bînin, lê bi ser neketine. Dîsa Sheri Laizer li ser rewşa Başûr û Kampa Etrûşê çavdêriyên xwe nivîsandine. Wekî din beşek ji Bîranên Apê Mûsa û nivîsa li ser zanyarê kurd ên berê Abu Hanifa Dînawerî ku ji Kur-



dish Life hatiye wergirtin, balê dikişînin. Mirov kare çalakiyên ku kurdan û hevalbendên doza kurdî li derve pêk anîne û çavdêriyên heyetên ku hatine Kurdistan û Tirkîyeyê jî rûpelên vê kovarê hîn bibe. Wekî minak li ser Konferans û Festivala Bonnê nivîs di hejmarê de cih digirin. Dîsa çavdêriya li ser Komcivîna Windahiyan balkêş e.

Her wiha gelek zanyar û dostên kurdan bi nivîsên xwe di kovarê de cih digirin wekî Lord Rea, Richard Wayman, Robert Olson, Mike Banda, Tony Lucas, Ned Parish, Mark Campbell, Hazel Greenwood, Colm O'Brien, Anne McCluskey, Catherine Drucker, Duncan Campbell, Norman Paech, Hans-Eberhard Schultz, Trevor Rayne, Nicki Jameson, Nicole Pope.

S. BERBEYAN

Wêneyekî ximam

Wêşanxaneya Nûdemê bi kovar û pirtûkên ku derdixê, pirtûkxaneya kurdî dewlemend dike. Digel gelek pirtûkên ku bi kurdî hatine nivîsandin, ji zimanên cur bi cur jî gelek pirtûkên hêja li zimanê kurdî tenê wergerandin. Çi xweş e ku mirov berhemên Jack London, Puşkin, Çexov û Mayakovskî bi zimanê kurdî bixwîne. Lê karê wergerê karekî giran e, hin caran wergêr bi ser nakeve, kesên ku wergêrê dixwînin an di naverokê nagihîjin, an jî wêneyekî ximam li ber çavên wan diçirûse û vedimire.

Dem a min "Şiirên Bijarte" yên Mayakovskî xwendin ev hest û raman bi min re çêbûn. Di pêşgotina pirtûkê de Wergêr Süleyman Demir dide zanîn ku wî jî mêj ve xwestiye Mayakovskî li kurdî wergêrine, bes piştî ku çûye Swêdê dest avêtiye vî kari, dîsa em jî vê pêşgotinê hîn dibin ku wêneyên di helbestên Mayakovskî de gelekî li xweşiya wî hatine, lewre jî wî xwestiye van wêneyan ragihîne mirovên kurd, lê mixabin digel hemû hewldanan, min nekarî wan wêneyan bibînim. Lê divê ez bibêjim ku min jî agahiyên ku Süleyman Demir der barê Mayakovskî de dide, gelekî sûd wergirt, tevî ku hinek çewtiyên rêzimanî di wir de jî hebûn. Li gorî daxuyandina S. Demir ew helbest bi piranî jî swêdî hatine wergerandin, lê birêz Demir nedaye zanîn ku helbest jî tu zimanên din wergerandine an na. Wekî encam, em jî dil û can beşdarî ramana wî ya ku dibêje: "divê helbest jî zimanê orjînal bê wergerandin" dibin û hêviya wî ya bi rengê "wê ev berhem rojekê jî rûsî bînin wergerandin" hêviya me ye jî.



Ez û Şivan Perwer û Koban

JAN DOST



Berî demêke ne dirêj, tîlên telefonê dengê Şivan gihandin guhê min. Bi rastî dema dostê min yê ezîz E. Ellûş got: "Fermo bi Şivan re biaxive." Min bawer nekir, min got belkî misqeran (henekan) dike, lê gumanên min belav bûn, dema ku Şivan bi dengê xweyê giran û xweş got: "Evar baş Jan.."

Me li hal û demên hev pirsî. Di dawiyê de Şivan got: "Jan Dost, helbesteke wiha xweş binivîse li ser Kobanê, ezê bikim stran!"

Min nexwest ez di rûyê hunermendekî mezin î wekî Şivan de bibêjim na, min soz da û got "Înşallah."

Bibore hunermendê delal, ezê li ser Kobanê çi binivîsim? Kobanî, ev bajarokê

biçûk ne warê pesindanê ye. Rast e bi dehan şehîd û şoreşger jê derketin û çend dostên min lê hene ku ew bêguman wê van çend xêzikên min bixwînin. Lê beranakî çê keriyekî gurî xelas nake.

Pênc heb ji rojnameya Azadiya Welat bi zorê tînin firotin li Kobanê.. Kobah... her tişt li Kobaniyê tînin firotin; ka, sol, rî... lê pirtûk li Kobaniyê wekî sêwiyên di roja Cejna Rojîyê de dîsa birçî û bêxwedî dimînin.. Ne tenê Koban, Efrîn jî... Amûd jî... Dirbêsiyê û Dêrik û her bajarên Başûrê Biçûk... Tevde hêkên mirîşkekê ne di guhnedana pirtûk û çandê de. Ev jî sûcê partiyên me hemûyan e ku tu roikeke baş jî bo çandê nelîstin.

Lê Koban jî her derê bêhtir hay jî çandê nîn e, bi sedan sîxur û ajan hene. Fitne û fesadî, paşverûtî, eşîrî, zikreşî û hesûdî... ev hemû manşet in di rojnameya Kobanê de. Evî û hezkirin qedexe ye. Zimandirêjî karê herkesî ye. Her kes xwe berpîrsê her kesî dibîne û jin hîn li Kobanê "eksîk" in.. Di Kobanê de bi sedan xanên genim û çewalên vala hene. Bi sedan dikanên sol û qondereyan hene. Lê kitêbxaneyek tenê

tune. Hema li Amûdê ya ku jî Kobanî biçûktir e ne kêmi sê çar kitêbxane tînin de hene. Tu kitêbên kurdî belav dikî, dibêjin: "Ma em çi bi kurmancî zanin?" Tu yê bi erebî jî wan re tîni, dibêjin: "Em ên kurmancî dixwazin!" Bi Xwedê ne ên kurmancî, ne ên sanskirîti, pirtûkên tu zimanî li Kobanê nameşin.

Navenda Çandê Erebî li Kobanê heye. Xwendina pirtûkên wê belaş e. Dîsa jî yek caran ez diçim wê derê ez kesî lê nabînim!

Gelo ev sûcê kê ye? Bêguman ne tenê sûcê partiyan e. Sûcê gel jî tînin de heye û li gorî meteloka îngilîzî: "Tu dikarî hesp bi zorê bibî ser avê, lê tu nikarî bi zorê bikî ew avê vexwe."

Îcar bibûre hunermendê me yê mezin, Koban ne warê pesindanê ye, rast e xelkên wê jî te hez dikin, lê ji ber ku qurûşekî wan tenê di hezkirina te de naçe. Bibore strana ku te xwest bi min re dernakeve. Ev ne tu bajar e û ne layiqî stranên e û bila xwendevanên min jî li min negirin û bila bextê xwe neavêjin û rast bibêjin: Werg e, lê ne werg e!

Ha aqilê jina min û ha aqilê Mîrê min



teslîmî min bibe, ezê wî berdim.” Piştî re Mîr diçe ba Elo Dîno û jê re dibêje: “Elo heke ku tu teslîmî min bibî, ezê te berdim û bibexşînim.”

Elo li hemberî vê pîrsê serê xwe radike û bi devekî bi ken wiha dibêje: “Ha aqilê jina min û ha aqilê Mîrê min..!” Ev yek li zora Mîr diçe û dibêje: “Elo tu çi dibêjî, tu min dikî hevalê jina xwe?” Elo wiha bersiv dide: “Gava leşkeran ez girtim, anîn ku min bi dar ve bikin, jina min dibêje ku tu fetilî ji min re kirasekî û cotek sol bîne. Te jî navmilê min qul kiriye, mûm di wan de pexistiye ku her niqetek dikeve ser laşê min, kezeba min dişewite û hê tu hatî ji min re dibêjî teslîm bibe. Ji ber vî qasî aqilê we wekî hev e. Welehî ez teslîm nabim.”

Îcar, îro jî komara tirk digel ku ketiye tengasiyê û ber bi pelîşandinê ve diçe, dîsa digel ku bi hezaran gundên me şewitandine, xera kirine, bi hezaran xortên me kuştine û bi milyonan gelê me koçber kiriye, pêrîşan kiriye û kezeba me şewitandiyê, radibin bang dikin û dibêjin bila gerilayê azadiyê werin teslîm bin.

Em jî bibêjin ku aqilê serokên komara tirk mîna eqilê Mîr û jina Elo Dîno ne..!

H. MEHMET KURHAN

Mîrê Cizîrê her dem ji eşîrên derdorên xwe bac (vergi) distend. Carekê ku dest bi stendina bacê dike, yekî bi navê Elo Dîno ku li ber Çemê Botan hukimdarî dikir, naxwaze bacê bidê û li hemberî Mîrê dertê. Mîr ferman dide leşkerên xwe ku herin wî bigirin û binin.

Leşkerên Mîrê diçin ser Elo Dîno. Elo Dîno digel ku li hemberî leşkerên wî baş li ber xwe dide jî, tê girtin û leşker dest

û piyên wî girê didin ku bibin Cizîrê. Gava ku Elo Dîno ji gund derdixin jina wî li pey dike gazî:

“Tu diçî bajêr, gava ku tu fetiliyî ji min re kirasekî û solekê bîneeeee! Tu ji bîr nekî haaaaa!”

Elo Dîno bi bêaqiliya jina xwe dike û serê xwe dihejîne.

Piştî ku Elo Dîno tînine hafa (ba) mîr, Mîr ji lehengiya wî diheyire. Piştî re fermanê dide leşkerên xwe û “Di ser nav-

milê Elo de du qul vekin, her qulekê mûmekê bixinê û pêxin, heya mûm xelas bibin...” dibêje. Leşkerên Mîrê vê fermanê bi cih tînin û dibe qareqara Elo Dîno...!

Piştî ku mûm di qulên ser navmilê Elo Dîno de pê dikevin û hêdî hêdî laşê wî tê şewitandin, Mîr ji xwe re bi vî awayî difikire: “Welehî Elo zilamekî leheng e. Belkî rojekê bi kêrî min were. Careke din ezê jê pîrs bikim, heke ku

BIXELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (47)

XAÇEPIRSA

Ç	D	Û	K	Q
HEKEM	PEŞAR	HEMEDAN	RO	OV
ŞEROK	KEVÎ	RIZÎ	AWARE	RENÂS
AK	LADDE	KEMALPIR		

PEYVA VEŞARÎ

Cihê çavdêriyê Hevala Eli Şer (wêne)	Helbestva neki kurd Lehiya berfê	Sûr Girêdan- eke fed- erasyonî	Maden Histri	Beşeke mizgeftê	Dayik, dê
		6	1		
Ziyaret				Gertafeke neyîni Beşekî rojê	
Festival				Edalet	
				Faaliyet	
Menzere			3	Safîkirin, helkîrtin	4
Xak					
		Paşgerek		Mücid	
		Pênûs, qelem		Dezi, ben	
Cihana ebedî					
Rik		7		Diravê Japonî	
Cinavkek			Gelo		
			Amerikan yûm		
Gihanekek		Elementa Argonê		Paşgerek	
Neteweyeke ciran			5		

Bersiva Xaçepirsa 45'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihjin me, emê wan binixînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 47'an pirtûka “ŞÎRÊN BIJARTE” ya Mayakovskî ye.


Jêrenot:-


Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn “Peyva Veşarî” di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 45'an, Albert Camus “Biyarî” qezenc kirine: Bedri Şeker/ Amed, Dîlvîn Aydın/ Amed, Figen Selçuk/ Tarsus, Egit Doğan/ İskenderun, Hamdullah Bakî/ Bursa

PEYVA VEŞARÎ





Rola hunermend ne kêmtirî rola serokekî ye

Destpêk Rûpel 8-9

Li başûrê Kurdistanê serekanî ji ber ku ne zelal bû, ew ked û xebata salan hemû beyhûde çû. Lê li Bakur ne wisa ye. Pêngavên ku diavêjin, bi rastî jî cihê şanazî û pesndanê ye. Daxwaza min ji bizava Bakur ew e ku, rê nede rêxistinên dîtir yên kurdan ku ew bikevin hambêza dijminan.

Bi kurtayî hûn dikarin bibêjin ku tevgêra wan bêdilê we bû û we tevgêra wan di berjewendiya kurdîniyê de nedidît?

● Tam berevajî bir û baweriyên min bûn. Pêgotiyek heye. Her çendî ne di exlaqê siyasî de ye jî, dibêjin "Em bi ser bêhna kebaban de çûn, em bi ser gû ve hîlbûn."

Hûn tevaya partî û rêxistinên siyasî yên kurdan ji nêzik ve dinasin û her wisa hûn bi piraniya serokên wan bizavan re jî rûniştin. Hûn îro rewşa siyasî ya kurdan çawa dibînin?

● Belê, rast e. Ez, pir hindik bi tevaya bizavên kurdan ji nêzik ve dinasim û bi serokên wan re rûniştim. Li gorî têgihîştina min, bi wî rengê kevn nema xebat tê kirin. Herçî Kurdistanê Iraqê ye, ez bi xwe ji serperêştîya (serokatiya) vê beşa Kurdistanê bêhêvî me. Par, ez bi hêviyê mezin çûme başûrê Kurdistanê, di demeke kurt de ew hêviyên min hemû rûxiyan. Bi destûra we, min divêt bi vê parçehelbestê ez nêrîna xwe ya der barê Başûr de bidim xuyakirin.

û serbixwe di destê van kesan de ye, ka çî kirin?! Belê tiştê kirin, ew tiştê ku Sedam li şûna xwe hiştin û reviya, hemû firotin.

Li Hewlêrê ez pêrgî pîrejinekê bûm, ji xwe re pars dikir. Min jê re got:

"Dayê, to, çî elêy bo rewşî em ro?" Got: "Kurim, ne Mame û ne kake, Sedam bo man zor çak e."

Yanî, ne Mêsûd û ne Celal, Sedam ji bo me jî her duyan çêtir e. Ez dibêjim min bersivê te da, ma hinde ne bes e?

Der barê Bakur de nêrîna we çî ye?

● Bakur... Bi rastî jî barê wan pir giran e, lê bîskêrê wan li serê çîyan e. Li başûrê Kurdistanê serekanî ji ber ku ne zelal bû, ew ked û xebata salan hemû beyhûde çû.

Lê li Bakur ne wisa ye. Pêngavên ku diavêjin, bi rastî jî cihê şanazî û pesndanê ye. Daxwaza min ji bizava Bakur ew e ku, rê nede rêxistinên dîtir yên kurdan ku ew bikevin hambêza dijminan.

Di encama vê hevpeyvenê de peyameke (mesajeke) we heye gelo?

● Berî her tiştî ez gelekî dilxweş im bi derkeftina rojnameyê xwerû kurdî li cihêkî wekî Stenbolê û ez pîrozbahîya xebatkarên vê rojnameyê dikim û daxwaza min ji gelê kurd ew e ku, li vê rojnameya xwe bi xwedî derkevin. Digel rêz û silavên min ji bo xwendevanên Azadiya Welat û ez gelekî spasiya we dikim.



Ez hatim ji deverên biyaniya
Min berê xwe da serê çîya.
Min go; diçim cihê hêviya
Dê xweş kim dilê sêwiya
ji Zaxo ta bi Xaneqînê
Digirim govend û şahîya
Lê ez hatim hey hawar e
Nê ew tas e, ne ew war e
Ne ew car e û ne ew bihar e
Kevneşefîq û mît û cahş
Hemî bûne xweşkir û baş

Ev serê şeş salan e ku Kurdistanê azad

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNİŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimîndeyê Giştî
yê Ewrûpayê:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Helim Yûsiv
963-21-960099

Berlin:
Silêman Sîdo
49-30-69002695

Hannover:
Selim Biçûk
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Bruksel:
Medenî Ferho
32-02-466037
Stockholm:
Robin Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçkalıç
49 228 66 62 49

Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Ew stêr in ji çavên me dixuricin

Dizanim Xalo te xweş lîland û tu ketî wê govenda mizgîniyê. Tu bûyî sergovend jî. Lê ez dixwazim vê ji te bipirsim. Te têra dilê xwe govend girt, te keleweca xwe şikand... te kezeba xwe hênik kir gelo!?

ZANA FARQÎNÎ

Te jî ajote ser tirsê û te ew di dilê xwe de heland. Tu pê jî nemayî. Te xwe li wan mirovên çê girt. Ew ên ku derketibûn bilindcihan. Cih û deverên paqijmayî, stare û penaha pakan. Erê çiya, çiyayên bilind, serê erdê.

Xwezgîniyên bîr û bawerîya wekhevîyê, biratiyê û serbestiyê, jî wan deran dest birine xwe û gemariyê ji binî ve dimalêşin, jî ser rûkê cihana gewrik a kev-nare. Ku dixwazin careke din, mirovahî li vê derê ji dayik bibe. Li navbera her du avan.

Te jî zêde xwe ranegirt, tirûş nekir û te da dû wan. Xwestina te ew bû ku, tu bi wan re, di milên wan de barana rami-nên xweş bibarîni... Ew ramanên ku hier kesî dike wekî hev û ne stemkariyê û ne jî stembariyê dipejirîne.

Bi wan peyayên mirovahiyê re, te jî zend û bendên xwe ba dan û dest pê kir, serê erdê şûst. Ji serî heta bi lingan, yanê seranpê.

Li hesabê te nehat ku tu xwe tenê bidî ber wê baranê û xwe pê bişoyî, jî qilêr û gemarê. Te got: "Wiha nabe em tev gunehkar in, tenê xweşştin têrê nake. Gerek dike em bişon jî. Em dê hem xwe ji gunehan biweşînin û hem jî mirovan biweşînin ji gunehan."

Û te wisa jî kir, lê tiştê ku ez bi ber dikevim, an jî min diêşîne ev e ku "feleka xayin" jî te re çep geriya. Çiyayê Spî tu neparastî. Hîn meha te neqediya li stareya mirovahiyê, xebera sar û cemidî gihiya me. Tu bi xaka ku bi berfê spî bûbû, hembêz kiribûn. Li sêgoşeya bajarên Amed, Mûş û Çewlikê (Bingolê), ligel hevalên xwe te rengê spî zivirandibû li rengê sor î gevez.

Di berfanbara 91'ê de, firokên Roma Reş, jî nişka ve girtibûn ser kampa we. Bêyî ku deng li we bikin, jî para ve cerdî ser we kiribûn.

Çima ez wan dibêjim tu zanî? Eger tu axaftinên ku me li ser mêranî û bêbextiyê dikir binî bîra xwe, tu dê fêr bikî. Stranên Şakiroyê Mûşî bes in ji bo jihev-fêmkirina me. Ha ez jî bîr nekim, wî dengbêjê çê jî xatir jî vê dinyaya derewîn xwest. Her cara ku ez lê guhdarî dikim tu têyî bîra min. Te gelek jê hez dikir. Ew qas sal tu li Stenbolê mabûyî jî,

dîsa ew her li cem te peyda dibû.

Tu jî, jî dengbêjiyê re ne "fena" bûy. Çaxa ku heval û hogiran bi te kilaş didan gotin, jî bîr naçe. Bûne wêne û mit mane.

"Dijminî jî bi mêranî" ma hikmê vê gotinê li cem terasan heye? Ma ew ne koremar in, ma ew ne bêbext û xiniz in? Ma ew ne rewîştan wên e, nizamim ku jî çi demê ve tê zanîn?

Heta niha min bi "te" û "tu" navê te hilda. Ez pir fikirim ku ez kîjan navê te bi lêv bikim. Navê te yê li ser nasnameya te nivîsandî "M. Mirza Bilgiç" an navê te yê dawîn "Tirêj"?! Kîjan?

An "Mîrze", an jî "Înce Mehmed", kîjan? Li gorî hinekan tu eynî "Înce Mehmed"ê Yaşar Kemal bûyî. A rast tu jî min jî bipirsî, tu jê ne dûr bûy. Jixwe te peyitand (îspat kir), bi çûna xwe ya serê çiya.

Xûy û kurmên te û yên gernasê Yaşar Kemal jî dişibiyên hev. Dirûvên we jî aliyê fizîkî ve jî bi hev diket. Rast bû ku tu "zirav" bûy. Ma jixwe "Tirêj" jî ne zirav e? Em jî kîjan aliyê ve lê binihêrin em binihêrin, te "ziravî" heq kiribû.

Di dawiyê de ez dê ji bo te navê "Xalo" bi kar bînim, wekî ku em hemû "hevalên" te vî navî bi kar tînin. Ez dê bibêjim Xalo. Ev hem navê te yî di nav dost û hogirên te de bû û hem jî tu bi rastî jî min re xal têyî... Ez nikarim bibêjim tu jî min re xal dihatî...!

Ew qas sal di ser re bihurîn, min ne-wêribû dest biavêta pênûsê û ji te re binivîsanda. Ez ditirsim ku ez jî binî dernekevim. Min hîna jî ev tirsê xwe ya ne-nivîsinê netirsandiye!...

Niha zîzbûna min li ber teqînê ye. Pinguriye, dike di dev de biavêje.

Gava min ew nûçeya nebixêr bihîst jî, ez negiriyam. Tenê di cihê xwe de leq bûm, tu bibêje "mit bûyî". Movikên canê min hev berdan, çok li min sist bûn, hew ez neketim erdê.

Stêr ji çavên min xuricin û ez bi hevalê din re mijûl bûm. Heta jî min dihat min ew teselî dikirin. Ez, Apo, Suat û Feysel. Em tev bi Feysel re eleqedar dibûn. Ji me tevan, wî dengê êşê, jan û tajanê jî xwe derxist. Em ne li malê, li kûçeyê Aksaray Stenbolê bûn wî çaxî.



Stêr dixuricin ji ezmanê welat stêr dixuricin dayê. Gotina pêşyan e, xuricîna stêran katî an jî çiyêna mirovên pak in jî rûkê xaka san.

Ez vê jî bibêjim ez naxwazim herime cihên ku em bi hev re lê mabûn. Çavên min bi wan deran bar nade. Gava bi rêgihanî jî rîya min bî wan dikeve, dilê min dikewgire. Te tînin hişê min. Ez çavên xwe digerin nagerînin tewş e. Kurt bibirim, dilê min li wan deran ronî nabe.

Ez vê gavê ku bi sedema salvegera te jî te re dinivîsim, hê jî wisa mit û mat

im... Piştî pênc salan, ev dibe yek ku ez jî te re reşbekekê dinivîsim. Min taqet nedikir. Ez niha, bi tenê sihêtiya xwe dikim.

Dizanim Xalo te xweş lîland û tu ketî wê govenda mizgîniyê. Tu bûyî sergovend jî. Lê ez dixwazim vê ji te bipirsim. Te têra dilê xwe govend girt, te keleweca xwe şikand... te kezeba xwe hênik kir gelo!?